

Sernivîser
Qado Şêrîn

Derhêner
Xorşîd Şûzî

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî



hejimar '20'

Çillê Pêşî 2013


شهرية تصدر عن رابطة الكتاب والصحفيين الكورد في سوريا

Can kurd



NIZAR QEBBANÎ

- Sûrî ye -



**Di riswakirina Seddam Huseyn da
Şergeha U'robotê
Kenok-girînok bû şergeha kendavê**

..... Rûpel (15)

Nesrîn Têllo

Deqek ji Facebookê

Her qeraxa dergehê vedibe
û tîrojek ronî jê şewq dide..



Memo û Jînê bawer dikin û ji mirna xwe radibin
bi êk cariya xemil û xêzên xwe tîn... destên xwe ji
hev re dirêj dikin, nêzîkî hev dibin, da Memo gula
sor biçîne, û bi sînga Jînê veke.....

Pişkojên jiyane di cana xakê dipişkivin, jenîne
hêvîyan di rewna wê kusb dibe, awazên şîn di
xwîna wê digre.... lê ji nişkê ve, qîrînîyek tê...

Memo û jînê vedicênîqin bi paş ve vedgerin.. bi
dilek şikestî diçin gora xwe...

Ev ne cara yekemîne ku em evîndaran dixapînin....
ev ne cara yekmîne ku em wana tînin devê çem û
em wana tîhin vedgerînin.. ev ne cara yekeme ku
em hêvîyan dişkînin..

Ji ber Habîlistan û Qabîlistanê me saturên xwe li
ser balgihên me diçînin, li hêvîya xewnên me
mana.....

Ta Kengî der bibin.. dê wan bigurînin.

Boniye Cegerxwin



Rûniştîye li ber pencerê

Rûniştîye l' ber pencerê
şaha perîzad û ciwan

Neynik li ber, por şeh dikî
çavan bi kilçûvî weşan

Gulyax li dêman radixî
Lêvan bi sorî, erxewan

Xemla bi sîm ber xo dikî
dildar bi şev tête mêvan

Şeyda ye dil awir geşin
Pertew dibarînin rewan

Vîna dil û eşqa biken
Bê hişkîrî gewdê giran

Kengî li dildar bê civîn
Awir bi tert berze bî can

Şakî dilê xemgîn ji xew
Ronî, şefeq berdê giyan

Hatin dema baskî mi bê
Dihna bi ken tê ser lêvan

Her dê li ser wî nal û key
Ew jî dibê jêr' dergevan

Ebdulbaqî Huseynî

zanin88@hotmail.com

Pêncşema zimanê kurdî li ser Facebookê

û çîroka zimanê zikmakî

Di destpêkê de gereke em sipasiya herdu rewşenbîrên xwe; Qado Şêrîn û Înayet Dîko û gelek zikêşên
din bikin, çimkî van herdu mirovan li gel gelek zikêşên ziman ên din hewl dan xwe, ku sudeyekê ji
mîdana Facebookê bibînin, û xwedî li zanimê xwe derkevin û bala nivîskarên kurd û herwiha hevalên li
ser Facebookê bikşînin vê babetê, ku postên xwe bi zimanê daykî binivîsin û belavbikin. Û li vê
dawî xuşka Barîn Mohammed ew jî bo endama vê kampanyê û name ji me re dişandin, ku em bi
berhemî giran li ser zimanê daykê rawestînin û binivîsin. Rûpel (4)



FEQIYÊ TEYRAN

(1590-1660)

Jînenîgarî û tiştin din



Yek ji helbestvanên mezin ên kurd e.

Perçeyek ji meqele "Klasîkên me – an sahir û edîbên me ên kevin" ya Celadet Alî Bedirxan: Melayê Jaba
di heqê Feqehê Teyran de gotiye: Sahirê siyê Feqiyê Teyran e ko navê wî Mihemed e. Eslê wî ji qesaba
Miksê ye, welatê Hekariyan e. Di tarîxa heft sed û diwê pey da bûye. «Hikayeta şêxê Senhanî» û «Qiseya
Bersîsayî» jî mewzûn gotiye û «Qewlê hespê reş» jî wisanî mewzûn gotiye û zehf beyt û eşaar jî qewî
mileme û rengîn gotine. Û navê wî jî di sihrê da «Mîm û Hey» e, û miqdarê heftê û pênc salan emir
kiriye û di tarîxa heft sed û heftê û heft da merhûm bûye û li Miksê jî medfûn e.

..... Rûpel (9)

Hoşeng Broka

hoshengbroka@hotmail.com



Sersalên vir..

û serslaên ji wir

Ez nizanim, çima her berf, ku sersal, sipî, di bin şevên sipî re, li ber pencereyên van welatên sipî, sipî, basa Xwedayên nuh, mirovên nuh, hezkirina nuh, dema nuh, cihê nuh, û dengûbasên spiyê nuh, dike, wir, ku Xwedê ji mêj de, li ser destên mirovên wî, mirî ye, tê bîra min.

Sersal, bê guman, ne ya sipiyê berfa îro, û Xwedayê berî çend êvaran, berî çend ramûsan, û berî çend piyalan e.

Mezopotamiyan, berî dora 4 hezar sal, sersal, nas kirine, û dem, cih, mirov û Xwedê, di nuhê wê de, li ser kevn û nuh, berî û piştî, pêşeroj û paşerojê, parve kirine.

Someran, ji serê sala nuh re, ku li pey salnameya wan, dikete destpêka meha Nîsanê, „Zogmoko“ digotin.

Babîlonan jî, heman dema nuh, a ji wexta heman Xwedayên nuh, wek „OKîto“ bi nav dikirin.

Mezopotamiyan, sersal, ku di meha Nîsanê de, pîroz dikirin, wek dema Xwedawendan, a herî „pîroz û bilind“, û herweha wek wexta kêf, eşq, şahî û zewaca wan, a „bilind“, li qelem didan.

Lewma, baweriyê wisa, a ji destên wan Xwedayên bilind ve, hebû, ku erd û asman, di vê „dema bilind“ de, tev li ser destên wan Xwedayan, diçin bilindbûnê: „şahiya bilind“, „kêf û seyrana bilind“, „hezkirin û eşqa bilind“, „serxweşbûna ji hawma bilind“, „zewaca bilind“ û „razan û sêksa bilind“, a ji memikên bilind heta bi ramûsanên bilind...ht d.

Heta roja îro jî, baweriyê wisa di nav Êzîdiyên îro de, heye, ku Nîsan, meha Xwedawendan û dema wan, a herî xweşik û bilind e, ku navên wan, ji wir diçin pîrozkirinê.

Lewma, ew (Êzîdî), heta bi vê demê jî, Çarşemba yekemîn (Çarşemba sor) ji Nîsanê, wek destpêka sala nuh, yan jî sersalê, li qelem didin û wî aliyê salê, wek „dema bilind“, dibin pîrozkirin û zermanîzekirinê.

Sersal, û wateya „dema nuh“, ji çandekê heta bi çandekê din, ji cihekî heta bi cihekî din, û ji Xwedayekî heta bi Xwedayekî din, mantiq-cuda, aqil-cuda, û cihêwaz e.

Lewma, bi ya min, mirov dikare cihêwaziya di navbera sersalekê û sersaleke din de, li ser asta millet û çandên cihêwaz, wek cihwaziya di navbera Xwedayên wan de, bixwîne .

Bi vî awayî, li gorî vê xwendina li jor destnîşankirî, mirov dikare, di sersalan, seqa û rabûn û rûniştinên wan de, dengûbasên jiyana û mirina Xwedê, bilindbûn û nizimbûna wî, pirrbûn û hindikbûna wî, û herwisa xweşikbûn û kirêtbûna wî, bi hesanî, bixwîne.

Di şeweyê lidarxistina wan demên bilind û nuh de, mirov dikare, Xwedê, di wan kêlîkan de, eşkere û zelal, bibîne, ku ew nuh e, yan kevn e; xweşik e, yan kirêt e; dirêj e, yan kin e; mezin e, yan biçûk e; fereh e, yan teng e; û ew di serê salê de, dijî, yan di binê wê û toza dîroka wê de, mirî ye?

Jixwe, yek ji cihêwaziyên herî mezin, yê navbera Rojavayê nûxwazane û Rojhilata kevnepêst jî, bi qasî ku ez dixwînim, ev

Cihê waziya di navbera Xwedê li „vir“ê Rojava, ku dijî, û Xwedê li „wir“ê Rojhilat de ye, ku ji mêj de, mirî ye.

Xwedê, li „vir“ê Rojava, serê sala nuh e, ku destê silavê û aşîfî ye.

Lê, li wir, ew sal hemû ye, serê wê û binê wê ye, ku ew destê bi darê zorê, nimêja bi darê zorê, „cîhad“, „fetwe“, kuştin, û talan e.

Xwedê, li vir, sersal e, ku eşq e, xwarin e, vexwarin e, mûzîk e, dîlan û dans e, hezkirin û maçkirin e.

Lê, li wir, ew, sal hemû ye, ku kîna e, hemî dinya û dîn e, êşkişandin e, êşkinckirin e, qedaxekirin e, laşzindankirin e, evînkorkirin û maç-boykotkirin e.

Xwedê, li vir, sersal e, ku ew mirov û mirov, û maç û maç, li erdê, bilind û bilind, hesan û xweşik, dijî.

Lê, ew, li wir, pêşiya salê û dawiya wê ye, ku ew hacûc û hacûc, pi hîn û pi hîn, li asmanan, nizim, çiten û kirêt, di mire.

Xwedê, li vir, sersal e, ku ew, her sal, xwe, mirovan, dinyayê, xweristê, xweşik, bilind û nuh dike.

Lê, li wir, ew, serê salê, nîvê salê û binê wê ye, ku ew xwe, hemî derdoran, û ser û binê xwe, ji asmanan heta bi erdê, di kirêtî, kevnepêstî, û zehirpêkirina dîrokê, werdike.

Xwedê, li vir, destpêka sala nuh, erda nuh û asmanê nuh e, ku pê re, her tişt nuh di be, û xwe nuh dike .

Lê, li wir, Xwedê, tim ji wir e, tim li wir e, ku ew tim binê salê, teriya salê, û taliya salê ye, ku her tişt pê re, ji asmanan heta bi erdê, di dîrokê werdibe, û di dûmahîka wî ê pirr kevn de, ku ne serê salê û ne jî destpêkan nas dike, asê di mîne.

Li vir, Xwedê, sersal e, ku çî gengaz, rihet, hesan û serxweş e .

Lê, li wir, Xwedê, dem hemî, cih hemî, erd hemî û asman hemî ye, ku çiqasî çiten, zehmet, biêş, û nexweş e .

Li vir, Xwedê, sersal e, ku azadiyê mezin e .

Lê, li wir, ew, sal hemû, ji serê wê heta bi binê wê ye, ku zindaneke mezin e.

Xwezî, bi vir, ku her sersal, Xwedê, ji asmanan heta bi erdê, ji nuh ve, dijî .

Ne xwezî, bi wir, ku Xwedê, ji serê salê heta bi binê wê, asman û asman, û erd û erd, her ku li bîra xwe û li bîra me tê, hezar carî di carekê de, û carekê di hezar carî de, di mire .

Ma Xwedê dijî..ji serê salê, li erdê, ku ji Rojava dest pê dike, û dihile, bipirsin?

Ma Xwedê mir..ji dawiya dîrokê, ku hemî dîrok di dawiya Rojhilat de, asê mane, bipirsin?

Hûn, gelek sersalan, ku Xwedê mezin, fereh, azad û bilind e, bijîn .

Hûn, gelek Xwedayan, ku sersal û sersal, bilind û mezin, dijîn, bi bînin .

BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ KURD DI CAVÊ DUNYAYÊDA



Beşê duyem

Yek ji serok komarekî ê berê ê ŞAY ê Ronald Rêygan derbarê netewa kurd fikir û ramanên xwe ên ne qenc weha anîye ziman: «Kurd firînge, çi dem ji mera pêwîst be, an jî kengê bixazin em dikarin vêxin». Her çiqas torîvanê vê ramanê jiyana xwe guherîve jî lê ev ramana wî îro dijî. Ez nizanim çiqasî yê durust be ku ez bersîva vê gotinê bidim. Lê gorî min ez ferz dikim pêwîste helwesta xwe derbarê vê gotinêda bînim ziman, bînvîsim, bîpersvînim, ev peyvir û deynê meye. Em gerek derfetê nedin ku derheqa gelê meda ramanên xirabdabin, me biçûk û bê feraset bila nizanbin. Rewşenbîr di hêla menewîda parêzgerê netewanin. Min ku ev gotin xwend hestê min tijî bûn. Ji bo ku ev gotin bê bersîv nemîne ez jî zanebûna xwe jî dîrokê, hest û ramanên xwe weha tînim holê. Lê nizanim ev bersîv yê bibe bersîveke bi sîyanet an na.

.... Mixabin hun dereqa meda gellekî çewt, şaş û xirab difikirin, bi van gotinan va hun di derbarê netewa meda cînyeteke mezin dikin. Ku em jî vaîskar û êrîskar bibûyana dereqa meda yê gotinên weha nehatana gotin. Evê dunya durî û kujerê mirovanda em ne êrîskar, ne vaîskar, ne jî talankarê cîhanê, gelan nebûne, xêrxwezî û aşîti armanc û daxwaza me bûye. Ji xwe zeiftir me tu wext pêpez nekirine.

Em altindarê dîrokê bûne. Ev dîrok îro tê wekilandin, em edaletê temsîl dikin, lê hun dujminê edaletê, lema jî hun hewl didin me vêxin, bere hev din. We hawqas zirarê gîhandîye kurd û Kurdistanê ez nizanim di pêşerojêda emê bikarbin ji bo van raman û emelên xirab we bibaxşînin (biborînin) an na.

Ku em biborînin jî lê dîrok... we mora talankarî û komkujîyê li dîrokê xistîye.

Dem hat gêhîşt em ê tu dem rê nedin ku yê mînanî we hest û sîyaneta mirovan û gelanra ji bo berjewendîyê xwe qirêj û sexte bileyzin. Em hemberî kujerê, ezraîlê, vaîskarê û dagirkerê mafên mirovanin.

Hun li ser bedbextîya mijyonan, gelan ji xwera bextewarî û pêşerojê digerin, li hemberî mirova hîyê sîyaseteke qirêj, durî, bê hempa, bê binge hestînin. Lê bese îdî, dema edaletê hat gêhîşt. Em sînorê edaletê dikşînin, agrê edaletê vedixin. Lê hun hewl didin agrê mirinê dadin, vêxin, şera gurkin.

Mirovahî hewceyî wekhevî û edaletêye. Kurdê dîsa bibin sembola edalet û wekhevîyê. Nevîyên we, torînen we yê nikaribin şopa weda bimeşin, emê wanra derfetê nedin firinga vaîskarîyê, talankarîyê, mirovkujîyê, hovîti û derewîyê vêxin navbera milyonanda nîfaq û şera pêjda bînin, gelanra bobelata çêkin, vê yekêra em ê rê û dirba nedin. Emê jîyanêke aza wekhev ava bikin ku mirov bikaribin rihet û serbest bijîn. Ji bo vê yekê hezar sale em rapêrîneke dîrokîdane. Em îro bi hest û ramanên qenc, bi daxwazên pîroz hewl didin rênîşa dîrokê biguherin.

Em bi hiş û fehmê xweva, bi raman û kirinên xwe va bandorî li ser her kesî dikin, cavê wan vedikin ku rastîyê bivînin, dagirkerîya, durîtiya dîrokî a deman û cîvakan bivînin, kirîna û firotana ku li ser nîrxên mirovahîyê tînin kirin bivînin, pêpezkirina mafê mirovan bivînin, dîmokratîya derewe sexte bivînin û serwestbin ku jîyanek nû, cîhanek nû paqij, qanûnên nû, dastanek bi wate orjînal pêwîste, dastana nîrxên mirovahîyêye giştî, kîjan ku her mirov têda bînin nîrxandin û mafê wan bînin parastin.

Belê dawî û axirîya desthilatdarîya we a bi çete tê, li hemberî we bi dastana nû va milyonê rawestînin, lewra mirovahîyêra jîna ku em dixwezînin, cîhana ku em nêtin dikin, pêşeroja ku em bi berxwedana dest tînin pêwîste, ... aşîti û wekhevî. Lê ji bo ku hun desthilatdarîya dunyayê bikin, miletan teslîmî xwe bikin, talan bikin ev nîrxên pîroz ji wera dest nade. Lema jî hun ji vaîskarîyê, durîtiyê dest bernadin.

Lê hun baş bizanbin mirov û gelên tîgêhîştî bi rêk û pêk, xwedênas bê edaletîyê qebûl nakin, naecbînin, xirabîyê hesnakin, zû dereng yê dijî sîyaseta we a bê edalet rawestînin, dawîya zorê tunene, wextê mirina raman û xastekên we xudbîn roj bi roj nêzîk dibe. Em hewl dikin dunya meda azadî û serxwebûna gelan, wekhevîya mirovan ser keve, şer neqewmin xwîn hilneşê, êrîskarî, zordarî ji holê were rakirin, bila dastana biratîyê bê nîvsarê, mirov destê biratîyê dirêjî hev dubikin, tevayî dunyak aram, geş siteqirî ava bikin.

Lê hun çî dixazin û çî nêtin dikin. Li ser xwîna mirovan û gelan heyîn û hebûna xwe diparêzin. Ewladên xwe jî mînanî xwe perwerde dikin û dijî nîrxên mirovahîyê, dijî azaya, rizgarîya gelan dimeşin, xwe pêştir yê din nabînin.

Dunya mera ji bo pêşerojê aşîti û wekhevî lazime, kurd avangardê van raman û daxwazên pîrozînin. Lê hun naxwazînin dunya meda edalet were berpa kirinê, gel di nava biratîyêda bijîn, mîntalêtat a we, dîroka we, timatîya we, vaîskarîya we vê yekêra astengî û pîrsîrêka pêşda tîne, ji bo ku hun bi dollarê xweva hukmî li ser cîhanê bikin li welatanda, deverên cuda-cudada tevlihevbûnê, nakokîya çêdikin, pêşketina gelan leng dikin.

Û bi vî awayî (weha) çawa dagirker, êrîskar mafê milyonan dihetmînin, mîntalîtêta we ya êrîskar bi xwîna milyon hatîye mewcandinê. Lema jî kurda firing dihesbînin Em dagirkerîyê, koletîyê qebûl nakin, bê edaletîyêra jî rê nadin.

Hela carekê dîroka xwe mêze bike paşê jî dîroka kurda bixwîne bê kurd kî bûne?

Dunyake bê edeb, sînî, bi tirs, tarî, bi şer we ava kirîye ji bo ku bê sînor hukmdarîyê bikin. Lê ev dunya mala me hemûyane, mala mirovahîyêye, em derfetê nadin ku hun li ser mirovahîyê hukmdarîya xwe bê edeb bidomînin. Lewma jî hun dijî me radiwestin.

Kurd xêrxwez û mirovhesin, sembola edlayê, altindarê dîrokê, meya laşê mirovanin, xwedanê nîrxên pîroz yê mirovahîyê, dilsozin,

bi hemdin, adil û xwedênasin, înterna çîonal, mîrxas, merd û bi cesaretin, şervanê rastîyê û edaletê, xwînê, neheqîyê, derewa hesnakin, ji xwe zeiftira pêpez nakin, pîra dostanîyê, nîrxandarê wekhevî û edlayê, parazvan û evîndarê mafê mirovanin, durî nijadperestîyê, ne êrîskar ne jî zulmkarin, keda helal hesdikin, hiş û ramanên xweva zelal û safîn, ji bo berjewendîyê xwe tu wext xirabîyê nakin, bi şerefin, mîrantîyê dinîrxînin, bi namûs û bi sîyanetin, xwdan vîcdanin, pêşengê qencîyê, bê temenne qencîyê dikin, dujmin û kujerê xwe jî dikarin biborînin, bi rehmin zû bendan bawer dikin.

Kurd xwedanê van nîrxên pîroz, giranbuha, girîng û balkêşin.

DÎROK KURDA WEHA DINIRXÎNE Û XARAK TÊRÎZE DIKE.

Dîrok kurda baş nasdikek, lê hun ji kurda hesnakin, lewra hun li ser derewan dimeşin û bi zulm û zorê nefesê distînin.

Dîroka we bi lekeye, dîroka mirovahîyêra rûreşîye. Careke din we testîq kir ku dereqa mirovan û gelanda hun tenê xwedanê raman û fikirên qirêj, ne însanîdane, hun hertim nêcîrvanê mirovan û gelan bûne. We û yê mînanî we kurd kirine vê rewşê a dijwar. Jîyanêke wekhevîda û aşîtiyêda jîne armanc û daxwaza mirovan a hezar salane. Lê hun hewl didin mirovan dijî hevdu rakin. **ADILBÛNA KURDA DÎROKÎYE.**

Kurd berpîrsîyar û garantê wekhevî, aramî û aşîtiyê bûne, lê îro hun bi navê dîmokratîya derew û sexte hewl didin dunyayê dêkin li bin bandora xwe, givak ku hun mafê mirovan, gelan ji têtore diparêzin. Lê têtore mezin hun bi xwene, hun dijî îrada (vîna), daxwaza gelan dimeşin. We bi xwe tamam zelal anî ziman, çî wext û kêderê ji were pêwîste hun di navbera mirovanda agira vedixin mirova bere hev didin, heyîn û hebûna wan bin tehlûkeke mezinda dihêlin, welatê wan dihetmînin, mal dewleta wan diçopînin. Bi fermana ewladên we jî îro çî cîhana meda diqewmin, hemû kirinên we zelal tê xuya kirinê, sîyaseteke qirêj didine meşandinê.

Li dijî welat û gelan hun bûne torîvanê koledarîya hemdemî, Hun hînbûne xirabîyê bikin, hun pisporê xwîn hilşandinê, xwîna mirovên amûtam. Ji bo berjewendîyên xwe her rezaletera hun amedane.

Mirovên aşîtxwez û azadîhes yê ku şert û mercên we yê kotî û qirêj ra qaîl û razî nabin bi biryar û bi îsrara weva bi salan girtîgehada tîne rencandin. Hun bi zorê hewl dikin milyon tabê îrada (vîna) xwe sextekar, hov û tamahkar bikin. Milyona bi derewa dijî hevdu radikin, cavê we ji zêr û zîvê dunyayê, ji niftê, ji keda miletan tîr nabe. Hun gelekî cavnebar, tima û xaînin li hemberî mirovahîyê.

Hun faîşê dîrokê û sîyasetê, pisporê îxanetê, lê kurd navdarê dîrokê, parazvanê nîrxên mirovahîyê. Lewma jî hun hewl didin kurda bişewtînin, bere hev din û bi sed salan paşda bavêjin, mecal û şansên kurda ên pêşketinê qut bikin. Ji bo ku kurd jîyanêda ser nekevin, serbilind nejin hun hertim emel û tedbîrên qirêj hemberî kurda didine şuxulandinê.

Lewra kurd ji we tîne cudakirinê xwedanê emelên tewrebilandin, torîvan û efrandarê, destekdarê, pişikdarê qencîyê, cav tîrin. Lê hun bi şer nefesê distînin, her tiştê we şer û derewin, we jîyanê xwe li ser dagirkerîyê, talankarîyê, komkujîyê û li ser

derewa ava kirîye, jîyanêda tu tişt têra we nake, hun gelekî xebîs û cav tengin (cavqulin). Lê derew û kirinên we bi azadîya meva yê qutbin, êrîşkarîya we ya li ser mirovahîyê, dîrokê bi rizgarbûna, serkeftina kurdava yê dawîbe, lewma jî hun ketine teşvîseke, telaşeke mezin.

Dastana me ya yekbûnê ji wera nerehet bûnê pêşda tîne, berxwedan û serhildana me we bê hesav digivşe. Berxwedana me ya dijî zulm û zorê, înkare her ku berfireh dibe, dibe ya giştî îdare kirina we ya ku li ser zorê hatîye damezirandin his dike ku yê nikaribe vaîskarî û talankarîyêra mijûlbe. Nefesa we hêdî-hêdî dimicqe. Cavê we ji mera tîr nabe. Em meydanada têgêhîştin, dunya me nas dike. Cavê dunyayêda em „merdin, mîrxasin, mirovhes û xêrxwezî, mêvanhes, dilsoz, dost perest, bi sîyanet û xwedênasin „ LÊ HUN KÎNE ???

Tîma û xwehesin jo bo we dollar, malê dunyayê, ji her tiştî hêjatir û çêtire, ji jîyana milyan-milyon mirovî pêşdatire. Lê ji bo me sîyanet û nîrxên mirovahîyê ji her tiştî çêtir û hêjatir. Hun hewl didin çî buhayî dibe bila bibe mirov, cîhan ji bo we bişuxule ji wera bibin dîl û kole. Em jî hewl didin sîstema dîltîyê, koletîyê ji hole were rakirin.. Wekhevî, azadî, biratî cîhana me rapêçe tu cudatî li navbera mirovan û gelan da tunebe. Lê hun çî dixwazin ?, Hawqas çek, top, firinde, çekên kîmyavî we çêkirine. Ev hemû dijî kêne ? Axi çîra hun çeka çêdikin ? Ji bo ku li ser mirovan alvêrê (bazirganîyê) bikin, li ser xwîna mirovan milyarda bidin hev. Qe çavên we ji xwîne tîr nabe. Bînhêre mabeyna meda çiqas ferq heye Hun hewl didin mirovan bikujin, welatan belakin ji bo dewlemendbûnê. Lê em berxwedanê dikin cîhanek azad, adil ava bikin. dijî xastek û emelên we em radiwestin, lema jî hun daxwas dikin me mînanî firingê vêxin.

Em demeke dirêje dîrokêda veşartî man, Lê naha em rabûne, em arîne û arîti ji me dest pêdike., ARÎYÊ KEVNAR Û KURDISTANA NEMIR „ Torîvanê vê kitêbê Galyama Salavate. EW zelal dinîvse ku kurd kalikê arîyanin.. Hun jî arîne, lê hun ji cilê xwe derketine cilê xwe begem nakin. Lê kurd layîqî resena xwene. Ev dunya hewceyî îrade (vîn) û toreyê me, mejûyê meye.

Kurd vê dunyayê ji nûva yê ava bikin.. Êstafêta jîyana durist careke din derbazî destê kurda dibe. Bi serkeftina kurdava dunyayê xaşbe. Lê hun vê xaşbûnê naxwazin. Ji altindarîya kurda dîroka mirova hîyê jî azad û zelal yê xuya bibe, dîroka tehrîfkirî ji holê yê rabe. Ev dîrok barbarên dîrokê qels û çewt kirine, girasekî qirêj û pintî lêkirine, paqijkirina wêra berpirsîyarî ketîye li ser kurdên hemdemî.. Lewra kurd dikarin rênîşa jîyanê buguherin û pîrsîrêkên dîrokî, global bi wîcdan çareser bikin.

KURD NAYÊNE KIRÎN FIROTANÊ (ÎSAÎYA, GLAVA 13-17, ZIMANÊ RÛSÎ

Kurd xwe nasdikin, têgêhîştin careke din nayên xapandin, nîrxên mirovahîyê ên pîroz hertim daxwaz û xasteka kurda bûye. Dema azadîya me hat gêhîşt. Vê mecal û derfetê kurd ji dest bernadin.

DIROK û REWŞA MIROVAHÎYÊ yê bê guherandin.

Desthilatdarê vê dîrokê a çewt ro bi ro acîz û zeîf dibin li hemberî me .

Îro welatê minda ê dîrokêda agirê azadîya cîhana me vêdikeve bi laşên kurdava . bedena kurdava gur dibe, ev agir natemire bûye meşel, bûye helebêtî, zindîbûn û cesaretê dide milyona. Sîmfonîya edaletê, aşîyê tî sêwirandinê. Vî dengî kes nikare bibire, dengê edaletê xastek û armanca kurdane.

Kurd cengewarê, risarê vê edaletê, mîrxasê aşîyê. Kurd – navê xwedayê rastîyê, heqîqetêye. Dunya durî ê hovanda jêra cî û rê, rûmet tune, veşartî û esaretêda maye. Ji bo ku zincîrê esaretê biqetîne bi qurnava destbi berxwedanê kirîye, bûye şoreşger, şoreşgerê demê. Li ber vê şoreşê we jî xwe şaş kirîye. Lewma jî hundir û mejûyê wêda çî ku heye bê hemdê we we anîye ziman... Ev jî mîntalîteta we. Bê şik vê şûnda her hemla we a dijî kurdan yê neyê sêrî, jê negire, lewra kurd raperînekê dane, bi hêzin, rêya heq û durustdane. Ev raperîn hun dizanin ku dijî weye lewma jî hun nerehetin. Milyonava mirovên planêta me ji kirinên we şil û şetin, seqet bûne. Ji wera nîfretê dikin .

Lê dereqa kurdada weha dibejin.,,

KURD AQLIN, ADILIN, NATÎQIN (ORATOR) POÊTÎKIN Û BI EŞQIN (ŞOX ŞENGIN

Mirov bê şik dikare bêje ku naşipe tu kesî miletekî mustesnaye (cudaye, fovgeladeye) . Kurd ku tera soz da dikarî bawerîyê lê bîni, xwedênas û mirovhesin (mirov perwerin),,, A. Vasîlyêv-ruhulutzan . Dîrokêda tu kesî xweser bi kurdan nikarî bûye şervan, azadîhes û bi vîcdanin . Kurd bi ruhê xwe ê nêzînkî xweda, torê xwe ê dilovanva naşipe tu kesî, miletekî tewre bilind... hêja û temîze. Layîqî jîyana bi rûmete. Miletekî bê hempa, bê eveze. Qehremanê dîrokî ê mirovahîyê. Lê hun kîne ?? Xwe naskirin şeref û sîyanete. Çarenûsa me ketibû li bin bandoreke bê edalet, hemberî me zû-zû cînyet diqewmîn. Ji mera hawqas zor û zulm hate kirin lê me xwe înkâr nekîr, ne ji em unda nebûn, me xwe parast. Ji xwe înkâr kirin ji vê mestîr jîyanêda cînyet tune. Lê we hîndû qilandin, betilandin ... **DUMAYIK HEYE** ...

Ebdulbaqî Huseynî

zanin88@hotmail.com



Pêncşema zimanê kurdî li ser

Facebookê û çîroka zimanê zikmakî

Di destpêkê de gereke em sipasiya herdû rewşenbîrên xwe; Qado Şêrîn û Înayet Dîko (Endamên komîta birêvebir a Hevbenda nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûriyê) bikin, çimkî van herdû mirovan hewl dan xwe, ku sudeyekê ji mîdana Facebookê bibînin, û xwedî li zanimê xwe derkevin û bala nivîskarên kurd û herwiha hevalên li ser Facebookê bikşînin vê babetê, ku postên xwe bi zimanê daykî binivîsînin û belavbikin. Û li vê dawî xuşka Barîn Mohammed ew jî bo endama vê kampanyê û name ji me re dişandin, ku em bi berhemî giran li ser zimanê daykê rawestînin û binivîsînin.

Ev gava pîroz cihê bextewariyê ye, ku hîn mirovên dilsoz hene û li ser pîrsa zimanê kurdî radiwestînin û ji dost û hevlan dixwazin ku tîkiliyê bikin...

Lê di bawerîya min, digel ku ev gav gaveke pîroz e jî, lê meydana Facebookê pîr tenge ku mirov berhemî xwe an jî lêkolîn xwe bi zimanê kurdî tîde belavbike, wekû tî nasîn ev meydan, meydana teknoloci lezoke, ango mirov sebir û aram wî tune ye, ku li ser Facebookê gotarekê dirêj an jî efsanekê bi sedê xêzan bixwîne, mirov hez dike ku posta li ser dîwar hatiye nivîsandin çend xêzbin an jî çend gotîbin...

Kampanya herî baş ewe, ku ev gav bibe derfeteke bo nivîskarên li ser Facebookê ku li xwe vegevin, û dest bi berhemî bikin, da ku di malperan an jî di rojnameyan de belavbikin. Li vir ezê bala hemî nivîskaran bikşînim, ku rojnameya me a Hevbendê (Hevbenda nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûriyê) a ku bi navê (Pênûsa Nû) heye, û beşê zimanê kurdî li bendî berhemî wan nivîskaran e, ku vê rojnameyê dewlemend bikin.

Ezê vegevim li ser girîngiya nivîsandina bi zimanê zikmakî û xwedî lê derketin, çî di warê rojane de, çî di warê tore û çanda kurdî de.

Berî panzdeh salan min gotarek di vî warî de nivîsandibû, ku guhdana li zimanê zikmakî erkeki netewîye,.. wê demê min çend nimûne anîbûn holê, ku rewşa me kurdên rojava pîr xerabe, eger tevgera siyasî û civakî û çandeyî xwedî li zimanê xwe dernekevin.

Wê demê min gelek rexn li nivîskarên kurd, ên ku bi zimanê erebî dinivîsandin dikir, herwiha li siyasetmedarên me kurdan, ku zimanê wan ê kurdî pîr qelsebû û gelek peyvên erebî di nav axaftina xwe de hebûn, eve ji bilî ku belavokên wan ên partîyan bi zimanê erebî bûn.

Şîreta min, di wê demê de, ji bo nivîskaran û siyasetmedaran evbû; ku xwedî li zimanê xwe derkevin, digel ku min dizanî mesele ne ew çendî hesane, û bitaybet ku li Sûriya tu derfet bo zimanê kurdî ji aliyê rêcîmê ve nehatbû dan.

Lê wekû ereb digotin, "bikêmasî evîndariya zimanê xwe ji dilên xwe navêjen".

Şanika min ji xelkên me re li dervî welat jî, di wê demê de, evbû; ku zimanê xwe ê kurdî biparêsin, û zarokên xwe fêrî zimanê daykî bikin, ligel zimanê wî welatê ku hûn lê,.. eve mesele ne gelekî hesane wekû teyorî tîgotin, lê di warê praktîkê de, pîr zehmete, nemaze ku ana em li dervî welat dijîn, û çawa zarok pîraniya wextê xwe li dibistanan û bi hevalên biyanî re ne, loma zimanê wî welatî zora zimanê daykî dibe, ji ber demê û ji ber zehmetiya jîyanê li dervî welat. Lê mirov bê hêvî nemîne, ku vîna mirovan hebe, wê bi kêmasî hin wextê xwe ji zarokên xwe re veqetîne, û bi zimanê xwe mijûl bibe.

Piştî qûnaxa 90 î de ji serdema çerxê çûyî de, dema ku me rewşenbîrên kurd li rojavayî kurdistanê dest bi belavkirina kovar û rojmaneyan dikir, wê demê me didît, ku çendî gel amedeye, ku bi zimanê dayka xwe dan û standîne bike.

Wilo jî ev hewldana pêncşema zimanê kurdî li ser Facebookê, di du heftiyê çûyî de, gelek hevalên ku herdem postên xwe bi zimanê erebî dinivîsandin, destpêkirin ku bi kurdî binivîsînin, .. û eve sîgnalekê baş dide, ku hîn kes hene xwedî li zimanê xwe derdikevin.

Lê li aliyê din jî, hin kes hene ku vê gavê gelekî pêwîst nabînin, nemaze ku welat di rewşekê aloz derbasdibe, û hişmendîya xwe gelekî bi mesela ziman bikarnaynin, û dibêjin; gelek millet hebûn, ku xebata di ber welatê xwe kirin û şoreşa xwe birin serî, paşre li zimanê xwe vegeviran û guhdanê.

Di gumana min de, gava pêncşema zimanê kurdî li ser Facebookê, gaveke pîroz e, û dikare bibe pirojeyê netewî eger mirovên meyî rewşenbîr û siyasetmedarên me xwedî lê derkevin, nemaze derfeteke mezin îro ro li welat heye, ku mirovê kurd dikare gelek qezencan bi destxîne!

Dr. Ehmed Xelîl



Kesayetiya kurdî Lêkolînên civaknasîn Wêrekî û lehengiya kesayetiya Kurd

Xelex - 11



Wergêr: Heyder Omer

Nirx û milet:

Nirxên miletan dergêhên naskirina wan in, eger tu dixwazî kesayetiya miletekî binasî, divê tu li nirxên wî bigerî. Ka kîjan ji wan nirxan berz e?. Nirxên mirovbendiyê û xwegihandinê, lê yên çepelî û werçepiyê (kêmanî)? Nirxên cangoriyê û azadiyê, lê yên radestiyê û koletiyê?. Yên serbilindiyê û aramiyê, lê yên xwenizimkirinê û xwedadînê?. Ka ew nirxan kesên, ku pê bawer in, ber bi pêxuriyê û reseniyê de, an ber bi jêbirinê û pişaftinê de dikşênin? Ka ew nirxan mirovaniya mirov dewlemend û hêzdar dikin, an mirovaniya wî tîk dibin û hildiweşênin?

Miletê, ku di rêveçûna dîrokê de, herî revok e, ew mileta ye, yê ku ji nirxên xwe tête birîn, ji xweyîtiya xwe havî dibe, ji nasnameya xwe direve, destan ji mirovaniya xwe dikşêne, û nirxdartirîn xebatên ku milet pê radibin jî çar in: Ya pêşî, bervedêriya ji bo erdnîgariyê ye, ji ber ku bê erdnîgarî, rûmet jî nîne. Ya duwemîn, bervedêriya ji bo dîrokê ye, çimkê bê dîrok, dûhatu nîne. Ya sêyemîn, bervedêriya ji bo zimên e, ji ber ku nasname bê ziman nîne. Ya çaremîn jî bervedêriya ji bo nirxan e, ji ber ku resenî û navdarî bê nirxan nîne.

Nirxên miletan ne leystik in, û ne jî tewş û mewş in, belê ewana rûdawên nasnameya mileta ne, ewana divêtiyine, ku milet ji bo pêkhanîna çêtirîn jiyanê, dafirîne, ewana ronîgeh in, di rêveçûna dîrokê de rêbertiya miletan dikin, bi ser de jî ewana pêkhata sereke ye ji bo pêkhanîna hişyariya tevayî ya milet, û ji bo wijdana tevayî jî bingeha gewherî ye. Nirx ne mîna kuvarkan e, ku di şev û rojekê de dertên û wenda dibin, belê ewana di navbera rêveçûna hezarên salan re bi hêdî hêdî pêk tên, di rêveçûna xwe de ew nirxan gur dibin, paqij dibin, tene guhertin, û heye jî gewre û bilind bibin, an jî biçûk bibin, biçelmisin û dagerin.

Wijdana entilcênsiyayî ya resen jî xaka herî şov e ji bo nirxên gewr e, wan ji rakêşên pîskirin û dagerînê diparêze, û şûna wan li nik nimûneyên payebilind diçespîne, da nişkek li pey yê din her tim ji wê wijdana tevayî werbigire.

Miletên, ku ji dîrokê tene avêtin, ne tenê ewên ku bi awayê fizîkî wenda dibine, belê ew miletên, ku rista xwe ya sinçî dişikê, û nirxên xwe yên resen û rûmetdar hildiweşin, û pêre jî dibin miletine nelihev û jihevketî, miletine revok, ku ji heykelên vala û ji berdest û koleyan pêk tên. Qeralên pirojeyên dagîrkirinê, di hemî serdeman de, bi wî awayî li gel miletên şikestî tevdigerin. Ev nimûneyê jêrin yekek e ji tevdîrên dagîrkeran:

Sala (547 b. z) bajarê Sardîs; paytexta Lidiya şikest, û Koreşê farisî dest da ser wê, û Kuroysos /Croesus (Qaron) hate dîlkin.

Gava Koreş vedigeriya Med, û Kuroysos jî wek dîlelekî pê re bû, kesekî lîdî, navê wî Baktiyas bû, li hember destlata Farisan rabû, gava Koreş nûçeya

nûçeya wê serhildanê bihist, biryar da, ku lîdiyan wek kole li bazara koleyan bifroşe, û biryara xwe ji Kuroysos re eşkere kir, Kuroysos jî tirsîya, ku miletê wî hemî mîna koleyan werin firotin, vê lomê pêşiyar kir û gote Koreş: “Boçûna min ew e, ku tu çekan ji bo wan qedexe bikî, bila ewana ji nûka û pêve miltanan di binê ebeyan de li xwe kin, û solên bilind pê kin, û fermanê bidî, ku zarokên xwe hînî gîtarê/tenbûrê bikin. Ezbenî! Eger te ev rîya girt, tuyê bibînî, ku pir naçe, ew mêran hemî dê bibin jin (ji ber ku jin di çanda roavayê Asiyayê de nimûneya jarbûn û lawaziyê ye) pêre jî nema hûn ji wan ditirsin”(1). Koreş ev pêşniyar bi cih kir, û pêre jî lîdî hatin ji bîrkin.

Rêvebirên miletan; yên ku berjewediyên kesayetî didin pêş, û xweşiya xwe di ser dûhatuwa gelên xwe re digirin, metirsîya hilweşandina nirxên payebilind nizanin, pêre jî ewana li ser serên gelên xwe dibine bobelatên giran. Ewana, çî zanin û çî jî nizanin, miletên xwe ber bi şikestinan de dikşênin. Xuyaye, ku Kuroysos yekek ji vî refê rêberan bû. Gelê Lîdî bi siwariyê û lehengiyê navdar bû, berê jî bi me re derbas bû, ku cengê di navbera dewleta Med bi serkêşiya Keyxusrew, û dewleta Lidiya bi serkêşiya Îlyatis, şeş salan (590 – 585 b. z) dirêj kir, û tevî ku dewleta Med, beriya çend salan dewleta Aşor ya hêzdar gêrkiribû jî, lê herdu aliyan jî nikarîn bi ser ketana. Gelo Kuroysos dizanibû, ku rê û awayê hilweşandina nirxên lehengiya gelê xwe şanî Koreş dike? Gelo ewî dizanibû, ku pêşniyara wî pizotê difinbilindiya (serbilindî) gelê xwe vedimrîne? Gelo, miletê ku ji giyana têkoşîn û goriyê bê par bimîne, dê çî dengvedana wî hebe?. Kînga miletên, ku ji beredayînan û berdiwariyan û nêrmeyan peda dibin, karîbûne û dikarin çarenûsa xwe bixin destên xwe?.

Kurd û nirxên siwariyê:

a. Siwarî çî ye? Siwarî nirxekî mirovanî yî mezin e, ku gelek nirxên paqij û ciwan û giranbiha di xwe de dicivîne; siwarî wêrekî û lehengî ye, Serfirazî û nepejirandina xwenizimkirinê ye, serbilindî û derûnpaqijî ye, evîna azadiyê û parastina rûmetê ye, têkoşîn û gorî ye, parastina boçûnan e, mirovbendiyê helwestan e. Siwarî ew e, ku tu ji xweberê rûbirûtiya diwariyan dipejirîne, û bi lehengiya yekta, bi bilindtirîn pileyên hêzê, û bi nirxtirîn awayên cangoriyê li gel çetiyar rû bi rû dibî.

Rast e. Siwarî li gel giyana cengewerî zor tîkildar e, bi ser de jî ew rûdaweke wê giyanê ye, lê eger siwarî ne bervedêriya ji bo nasname û rûmet û mirovaniya mirov be, nikare nirxê xwe yê mirovanî bistîne.

Eger siwarî evan nirxan hemiya di xwe de dicivîne, ma wê çawa şûna payebilind di çanda miletan de nestîne? Û çawa milet dê rêza siwaran negirin? Çawa nişên duhatî dê wan siwaran di her rewş û pergale de ji bo xwe nekin rêber, di bîriya xwe de zindî nehêlin?.

b. Jêderên dîroka roavayê Asiyayê û belgename yên nivîsevanên li gel Kurd tîkildar bûne, didine xuyakirin, ku siwariya kesayetiya Kurd nirxekî resen e, vê lomê em bawer nakin, ku lîgervanê ermenî Eboviyan dê bê wate gotibe: “Em dikarin Kurd bi (siwarên rojhilatê) binavînin, ji ber ku rûçik û taybetmendiyên hevbeş yên vî miletî ewe ne, ku her tim ji bo şer amade ne, û rastgo û bi tore ne, û ji bo mîrên xwe jî dilsojên bê hemta ne, ji gotina xwe danagerin, mêvantiya wan paye bilind e, tola xwîna rijyayî hildidin, neyartiya êlî di navbera nêziktirîn mirovên hevdu de peyda dibe, ji bo talanê û rêgirtinê xwe radigirin, û bi awyê bê hempa rêza jinan digirin”(2).

Li gor boçûna Eboviyan, siwariya Kurd di van nirxan de diyar dibe: Amadebûna domdar ji bo şer, evîna azadiyê, parastina rûmetê, nepejirandina hemî awayên sernizmiyê û riswabûnê, rêzgirtina bawerî û boçûnê, hêzdariya helwestan, hev girêdana gotin û kiran, dûrbûna ji awayên xapandinê û xiniziyê, rêzgirtina xweyîtiyê ya kesên din, nepejirandina rêbazên dijmaniyê, dilsojiya ji bo rêberan (entilcênsiya), payebilindiya mêvantiyê û rêzgirtina jinan.

Lê tolhidan awayek ji awayên tirsandinê bû, ku di qunaxa civakî êlî de bi kar dihat, ji ber ku, li gor rêbaza (kuştinê re li ber kuştinê digire) humayekî parastina jiyana mirovaniyê bû.

Lê talan û rêgirtin û tîkiliya wê li gel nirxên siwariyê, emê paşê bi firehî lê binerin.

Gava Mînoriskî bala xwe dide gotina Eboviyan, dibêje: “Eboviyanî Kurd bi (siwarên rojhilatê) dinavîne, bê guman ev danasîn hîna jî wateya xwe diparêze, nemaze ji bo çîna bilind (serkên êlan û derebegan), ew jî boçûnek e, ku hêjayî jiyana serdemên naverast in li Kurdistanê”(3).

Nîkîtin hevtîkiliya nirxên siwariyê û bidestxistina hespan li ba Kurd ronî dike, vê lomê jî dibêje: “Kurd, bi gelemperî, siwarine jîrek tene nişankirin, hemî gerokên, ku seredan deverên Kurd kirine; ew deverên, ku yên hesp lê tene xwedîkirin, her tim pesna nirxên siwariya wan dane”. Û gava hewesa siwariya Kurd di demên cejnan û dawetan de salix dide, weha dibêje: “Xortên Kurd bi hespên xwe ve ji bo cirûbaziye kom dibûn, her yekî ji wan hewl dida, ku reseniya hespê xwe biçespîne, bi hevdu re baz didan, ka dê kî bi ser keve, û di heman demê de hinekên din jî pesna jêhatîbûna hespê xwe dida”.

Nîkîtin gotina xwe bi dawî tîne, û dibêje: “Gerok û zanyaran rûçikên siwariya Kurd wek sedema ciwanî û çetiriya stiranên Kurd didîtin”(4).

c. Siwarî û çanda tevehî(Meşai): Di rûpelên berê de hatibû diyarkirin, ku nirxên civakan beşekî çanda wan ya resen e, û çandên civakan di serdema kevirî ya kevin (Paleolithic) de pêk hatibûn, ew jî serdemeke gelekî kevnar e, ew çandan di serdema kevirî ya navend (Mesolithic)

de, ya ku ji derdora dehemîn sedsala b. z de dest pê dike, bi rê ve çûn, û di serdema kevîrî ya nû (Neolithic) de birêveçûna xwe dom kirin; ev serdem jî ji derdora nehemîn sedsala b. z de dest pê dike. Her weha berê jî me dîtibû, ku çanda civakan ji valahiyê peyda nabe, belê ew berhema tevlihevbûn û hevtêkiliya sê pêkhata e: Pêkhata zindî (biyolojî / geneyî), pêkhata êkolojî û pêkhata dijîtî (rûbirûtî).

Di wan kevintirîn serdeman, û di çarçewa wan her sê pêkhata de, civakan, ne ji bo kirên bê wate, helwest û nirx û nimûneyên xwe yê bilind afirandin, belê ji bo ku bibine mertalên ku heyîna wan ji pişaftinê, û perjanên, ku wan ji metirsiyan biparêzên, û karînen ji bo jiyana hêja pêk bînin. Eger em cûreyê jiyana wan serdemên kevîrî binin bîriya xwe, ku jiyana wê hîngê hîna negîhabû asta eşîr û êlan, û mirov bi awayê komên kêmjimar dijîyan, em dê di giringiya hewcedariya komên mirovan, ji bo bestxistina nirxên mirovane yê resen, bigihînin.

Belê.. Eger mirov ne çavbiçik û leheng be, dê çawa têkeve kûryaniya daristan û çîyan? Dê çawa li hember direndeyan berxwe bide? Eger ne hêzdar û wêrek be? Dê çawa hevpîşeyan ji dest şêrên hêrsdar, pilingên xedar û hirçên swadar biparêze? Eger ji giyana cangoriyê bê par be? Dê çawa nîçira xwe bi nîçirvanên bê şans re par ve bike? Eger ne mirovbend û ne mirovhez be?

Dê çawa jin karibin zarokên xwe di şikeftan de biparêzin, gava mîr bi dûr de diçin nîçirê, eger ew jinan ji giyana piştgirtinê (hevgirtinê) bê par bin. Û dê çawa li hember hêrişên direndeyan pêdar bin, eger ne wêrek bin? Û dê çawa civaka tevehî karibe jiyana xwe organîze bike, eger ew civak ji entilcênsiya, ku van nirxên jorîn hemiyana di xwe de dicivîne, bê par be?

Hema Bi kurtahî: Nirxên mirovane, û yê siwariyê jî di nav de, berhema serdemên tevehî û xweberiyê ne, ew serdemên, ku mirov di civakê de pişaftî bû, û (zêdebûna berkar) jî hîna nebûbû alav kedxwariyê û riswakirinê û koletiyê, ew serdemên bê hebûna koleyan, her kes tê de aza bû, û hemî kes ji hêla mafan û pêdiviyana de weke hev bûn, ew serdemên, ku birêvebirî hîna nebûbû destlata, ku qirik û dilan beriya heşên mirovan bi zincîrên sitemê dibestîne, û şaristanî jî nebûbû hêlîna ezeztîyê û xweheziyê û tirsê û xapandin û xiniziyê. Û bi qasî ku civakên mirovane li gel bingehên çanda tevehî, kêman jî zêde, têkildar bûn, ewqas jî nirxên serdemên xweberiyê, yê siwariyê jî di nav de, parastin.

Bi baweriya bê hempa, ez dibêjim, ku civaka Kurd, li seranserê dîroka xwe de, li gel bingehên çanda tevehî têkildar bû, bi ser de jî ez xwe wek kesekî bi kesekî bi çavên xwe hinek diyardeyên jiyana serdema kevîrî ya nû dîtine, ku di jiyana civaka kurdî ya şivantî û zevî de heya derdora nivê sedsala bîstem hîna jî diyar bûn.

Rast e, civaka Kurd ketibû pença tariya nezanîne, û bi pizota xizaniyê dişewitî, û didanên havîbûna xweyî di gewdeyê wê de diçûne xwar, û pirojeyên çepelkirinê û wendakirina nasnameyê ew dihêra, û neyênîyên hizra êlperestî ew tar û mar dikir, û entilcênsiya ezezok û hişteng û revok ew ber bi werçepiyê de dikêşa. Lê tevî vê jî, û bi xebata entilcênsiya resen, ev civak bi rikdarî li ser piyan rawestiya, û xweyîtiya xwe bi difinbilindî

(kibriya) diyar kir. Gelo eger ew nirxên gewre, ku ji serdemên tevehî de di wijdana komelî de şûn girtine, nebûna, wê vê civakê karibûya ev yeka pêk baniya? Êdî ka em li nirxekî ji wan, ew jî wêrekî ye, binerin. Ka em dê çi bibînin .

Belgeh:

Jêderên dîroka Kurd sermiyanê wêrekî û lehengiyana wan didine xuyakirin; ev sermiyan berî pêşî di navê wan (Kurd) de diyar e. Tiştê diyar ew e, ku berî pêşî Someriyana pêşiyên Kurd, yê çiyayên Zagros bi (Kur-du, Kur-tu) navandin, wateya vî navî jî (çiyayî, niştevanên cihên bilind) bû, bi ser de jî salix, an rûçikê (çiyayî) wateya wêrekîyê û hêzê diyar dikir. Ev şeweyê (Kur-du) paşê bi şeweyê (Kardo) hate guhertin. Nîkîtîn ji bo vê yekê dibêje: “Peyva (kardo) wek peyvîna Samî ye, nemaze jî di zimanê Akkad û Aşor de, wateya wê jî (neteweyî, leheng) e, û peyva (karduwa) wateya (wê bibe leheng) dide”(5).

*. Diyakonov dibêje: “Şahên (qeral) Med wêrek bûn, xwedî hêz û zîrek bûn, bi zîrekî didan ser çetiyân”(6). Û bi ser de jî dibêje: “Med, li gor Faris û Sekakiyan, bi wêrekîyê navdar bûn, kesan xwe dispêran wan, ewana di nav leşkerê Xeşyarşah de hêza herî li pêş bû”(7).

*. Gerokê Emazîx; Ibin Betote yê ku li gel Kurdên çiyayê Şengalê têkildar bûye, dibêje: “Niştevanên Şengalê Kurd in, û wêrek û camêr in”(8).

*. Nivîsevanê navdar; xwediyê gelek berheman, Ibin Hecer El-Eşqelanî (sala 852 k / 1449 z miriye) gava Kurd dinasîne, dibêje: “Kurd kesine, ku bi wêrekîyê tene salixdan, mîna Eiraban li çîyan rûdinin, ew jî kesine pir in”(9).

*. Gava dîrokzanê kurdî, Şerefhanê Bedlîsî (sala 1604 z miriye) wêrekiya Kurd salix dide, dibêje: “Piraniya komên Kurd bi wêrekî û sergermiyê û qîretiyê û camêriyê navdar in, û hezkirina kesên din, nepjrandina sitemê û xwebaweriya bê hempa nirxên wan yê resen in, ewana di van nirxan de pê de diherin, û weha diçin, ku birrîna rêkan, û jidest-istandina eşkere di çîyan û geliyan de ne şerm e, lê ji bilî diziyê û talanê, ji bo vê yekê jî zîrekiya pir û wêrekiya bê hemta divên. Da ku Kurd van rûçik û salixên navdeng û baş bi destxînin, xwe davêjin ber çetîniya û kuştinê, da ku alîkariyê ji kesên bê rûmet û erzan nexwezî.... Ewana bi dilsojî li gor penda, ku dibêje (kesê ku bi dawiyana birame, nikare bibe wêrek) tev digerin, pêre jî ewana guh nadin dawîya tiştan û kiran, heye jî bi carekê bi wan dawîyan naramin”(10).

*. Şerefhanê Bedlîsî dîsan dibêje: “Xuyaye ku peyva (Kurd) wek rûçikê (salix), ji bo wêrekîyê, bi ser wan ve bûye. Tiştê vê yekê dide xuyakirin ew e, ku gelek leheng û wêrekên navdar ji vî miletî peyda bûne û rabûne; yek ji wan (Rustemê Zal) bûye, yê ku di serdema Keyqubad de jiyaye(11), û ew bi navê (Rustemê Zabîlî) navdar bûye, ji ber ku li herêma Sîstanê (Sicîstan) ji dayikê bûye, û Firdewsî yê helbestvan; xwediyê Şahnameyê ew bi navê (Rustemê Kurd) bi nav kiriye. Her weha yekekî din ji Kurd; navê wî (Behramê Cûpîn) bû, ew di serdema şahê Ecem; Hurmîz kurê Enoşîrwan de, esbehsalar / serleşker bû. Ew li Tirkîstan û Xurasanê jiya ye, û di cengên wan de navdar bûye, binyata Kurtîyan û siltanên Goriyan di serdema îslamê de digihênin wî. Yekekî din jî ji kurd bi navê (Gorgîne Milad) e, yê ku navdengiya wî li dinyayê

belav bûbû, vaye ku çar hezar sal di ser serdema wî re têper bûne, û hîna jî kur û neviyên wî li eyaletê (Lar) li başûr-rohilatê welatê Fêris, serbixwe dijîn”(12).

*. Şîhab El-Dîn El-Alosî (1854 z miriye), xwediyê pirtûka (Roh El-Meanî/Giyana wateyan); ku şirovekirina Qur-anê ye, dibêje: “Kurd, bi tevayî xwedî hêz in, gelek kes ji wan comerd bûn”(13).

*. Kurdnasê Rûs Filadîmîr Mînoriskî (1877-1966 z), ji ber Son; şarezayê kurdnasiyê werdigire, û dibêje: “Metirsiya berdewam nebawerî, wêrekî, sivikî û lezokiya bê hempa, û çavdêriya bilind li gel Kurd afirand”(14).

*. Gava kurdnasê Rûs Basîl Nîkîtîn (1885-1960 z) êla Hemawend a Kurd salix dide, ji ber (Dîkson) werdigire û dibêje: “Devera navbera Kerkûk û Silêmaniyê devereke kurdên Hemawend yê wêrek in, ew jî êleke koçer e 2 hezan tivingên wan hene, ji bilî hesp û çekan û talanê bi ti tiştên din ne pêxur in”(15).

*. Gava Nîkîtîn kesê Kurd salix dide, dibêje: “Ew şervanekî leheng e, ji bo tevayê komelê her cangoriyê amade ye, pêxurê resenî, kok û biyat û buhêreka xwe ya têkoşînê ye. Siwarekî pêşber e, xemxwerê cilên xwe yê rengareng in, hezkirê çeka xwe ye”(16).

*. Jonatahn Randall; rojnamevanê emerîkî, Kurd salix dide, û dibêje: “Ewana hêjane, ku mirov bi wan serbilind be, ji ber ku ewana xwediyên hestên germ û şahî û wêrekîyê ne”(17).

Wêrekî (Nimûneyin ji dîrokê):

Di jêderên erebî îslamî de gelek nimûne hene, ku wêrekiya Kurd diçespînin, da ku em gotina xwe dirêj nekin, em dê tenê hinekan ji wan nimûneyan binin zimên. Vê lomê em dê ji dîroka cengên, ku di vavbera roavayê Asiyayê û Ewropayê (xaçeperestan) de qewimîne, ewên ku bi navê (cengên xaçeperst) hatine binavkirin, dest pê bikin. Tiştê hatiyê zanîn ew e, ku ewropîyan ji sala (489 k/ 1096 z) de dan ser rohilatê deryaya Sipî, û sala (490/491 k/ 1098 z) mîrişîna Rehayê dame zirandin, û paşê jî sala (491 k/ 1098 z) mîrnişîna Entakyayê, û sala (492 k/ 1099 z) şahnişîna Qudsê, û sala (502 k/ 1108 z) jî mîrinişîna Terablîsê li Libnanê, damezirandin, û wê hîngê Tirkmenê Silcoq serdestên roavayê Asiyayê bûn, dewlet û mîrnişînen Kurd gêr kiribûn, û destên xwe, ji herdu hêlên rohilat û roava de, dabûn ser Kurdistanê.

Di yekemîn nivê sedsala (6 k / 12 z) de malbata Zengî, ku yekeke silcoqî bû, diyar bû, û li kurdistanê cih girt, û bi hêla roava de ber bi Rehayê û Entakyayê û Heleb û Şamê de çû, vê lomê erka nakokîya dij ewropîyan bû stûbarê wê. Her kesê, ku firehbûna dewleta Zengî, ji Hewlêre de li hêla rohilat heya bi Misîrê li roava, veko, dê wê encama nîma bi destxîne, ku hêza şervaniya Kurd û nirxên siwariya kesayetiya Kurd berztirîn humayên serkeftinên wan bûn li hember ewropîyan.

Sala (532 k) malbata Eyyobî ya kurdî, bi serpereştiya herdu birayan Necmedîn û Şêrgo, û bi wan re êla Rewadî/ Ro adî jî, ya ku şaxekî êla Hezban/Hedban, ya ku bi siwariyê û hespên xwe navdar bû, li Mûsilê tev li Emadedîn Zengî bûn, û bi sedema giyana cengewrî ya Kurd û coşa ayînî, pirên şervanên Kurd di nav leşkerê Zengî de tev li

Eyyobiyên bûn, û Şêrgo ji wan û ji hin Tirkmenan gurûpekî leşkerî, li gor paşnavê xwe (Esededîn/Şêrê ol) bi navê (Esediyê/Şêrgowî) çê kir; piraniya wan jêhatîrînên şervanên Kurd bûn, û Sulhedîn/Selahedîn jî yek ji wan bû.

Evê gurûpê, bi serperştiya Şêrgo, serkrftinên balkêş bi dest xistin, pêre jî Şêrgo di dewleta Nûredîn Zengî de gîha wê pileya, ku di roja îro de bi şalyarê bervedêriyê tê naskirin, û Nûredîn her tim pêdiviyên leşkerî yên metirsdar didan dest wî, û ew kire serdarê beroka şêrê roava (devera Himsê) li hember ewropiyan, ji ber ku ew dever metirstirîna berokan bû.

El-Bundorî dibêje: *“Bi sedema ku Şêrgo jidil, zîrek, leheng û wêrek bû, parastina beroka Himsê, ku metirstirîn berok bû, kete destên wî”*(18). Û ji bo payebilindiya Şêrgo jî Ibin El-Esîr dibêje: *“Bi sedema ku Nûredînî jêhatîbûn û zîrekiya wî di cengan de dît, ku kesek nikare wek wî tev bigere, ji ber ku çavbiçik û wêrek bû, ew ji xwe ve nêzik kir, û derebegiyek da wî”*(19).

Bi sedema wêrekiya Şêrgo, siltan Nûredîn Zengî sala (559 k) ew li ser serê leşkerê şande Misirê, da wê ji metirsiya talana ewropiyan rizgar bike. Li ser vê yekê Ibin El-Esîr dibêje: *“Gava ev sal hat, û Nûredîn tevdira xwe kir, ku leşkerî bişîne Misirê, ji bo vî karê giran, kesek ji Şêrgo rastir û wêrektir nedît, loma jî ew şand*(20).

Wêrekiya Şêrgo di navbera derketina wî ji bajarê Belbîsê yê Misirê re xuya dibe, wê hîngê herdu leşkerên ewropiyan û Misirê ew sê heyvan di wî bajarî de dorpêç kiribûn, û paşê li hev kiribûn, ku ew bi leşkerê xwe ve ji wî bajarî bi derkeve. Dîrokna Ebo Şame dibêje: *“Kesekî, ku Şêrgo dîtibû, gava ji Belbîsê bi derketî, gote min: Min dît, ku hogirên xwe bi derxistin, û bi xwe jî li dawiyê ma, bivirekî hesinî di dest de bû, da dawiyê leşkerê xwe biparêze, û misilmanan û ewropiyan jî lê dinerîn. Kesekî ewropî yî biyanî, ber bi wî ve hat, û gotê:*

Aya tu natirsî, ku ev misilmanan (leşkerên Fatîmiyan) û ewropiyan, ku tu û hogirên te dorpêç kirine, te bixapînin, û bidin ser we, kesekî ji we nehêlin?! Şêrgo gote wî: Xwezî wilo bikirana! Te dê tiştê, ku te ndîtî, bidîta, Bi navê Xweda, min dê şûrê xwe rakira, û heya min gelek mêr nekuştana, nedihatim kuştin. Bi navê Xweda, eger hogirên min bi ya min kiribana, ezê ji roja pêşî de derketama pêşiya we, lê bi ya min nekirin. Hîngê ew kesê xaçeperst nişana xaçê bi destan li ser rûwê xwe çêkir, û got: Gava xaçeperstên van deveran tu û tîrsa xwe ji te salix didan, em matmayî dibûn, a niha em wan diborin”(21).

Pirs ew e. Çima siltan Nûredînî Şêrgo dida pêş mezintirîn serdarên Tirk di nav leşkerê xwe de? Aya sedemeke din heye ji bilî baweriya wî bi wêrekî û çavbiçikî û hêza Şêrgo?. Heye ev yeka hîn bêtir rava û diyar bibe, eger em ji bîra nekin, ku Tirk mileteke, ku bi wêrekiyê tete salixdan, vê lomê jî gava xelîfeyê misilmanan Omer Bin El-Xettab, pê haydar bû, ku şervanên Ereban li hember Tirkan gelek cefa dikêşin, got: *“Ev dijîmekî hêzdar e, tiştên hindik ji wî tene istandin”*(22). El-Chahêz jî di nameyêke xwe de wêrekiya Tirkan pesinand. Eger Tirk bi vî awayî wêrek bin, gelo wêrekiya Şêrgo çiqas bilind bû, ku ket pêşiya wan?! Ji bo ku mirov wêrekiya Kurdan, çi serdar û çi leşker, di cengên xaçeperst de bizane, dikare bûyerên wan cengan vekole, da

bibîne çawan Sulhedîn/Selahedîn û birayên xwe, û hemî entilcêsiya û leşkerên Kurd bi wan re, şer dikirin, û bi jîrbûnî ber bi mirinê de diçûn. Em dikarin çêla nimûneyekî wêrekiya wan di cenga Hittînê (583 k) de bikin. Siwarê kurdî, Dîrbas, ku ji êla Mihran/Mîran e, di wê cengê de, şahê Qusê dîl kir, ew şah jî serleşkerê xaçeperstan, û mezitirînê wan bû. Di gotûbêjêke din de, tê gotin ku Dîrbasî siwarê xaçeperstan, yê navdar Ernat (Rîno Do Şatyon) jî dîl kir. Gelo, divê mirov çiqas wêrek be, da karibe di konê serleşkerê dijmin de bide ser wî, parêzerên wî derbas bike, û wî dîl bigire(23)?!

Nimûneyekî din ji wêrekiya Kurd di cengên xaçeperstan de. Siwar û helbestvanê Erebi; Usame Bin Munqêz, ku pir li gel Kurd têkildar dibû, dibêje: *„Yekek ji lêdanên matî ew e, ku mêrekî Kurd, navê wî Hemedat bû, dostekî kevin bû....temenê wî pir bû, û çavên wî jî jar û lawaz bûn, kurukên wî jî hebûn. Mamê min Îzedînê rehme lê be, gote wî: Hemedat, tu mezin û jar bûyî, te maf heye, ku em karmendiya te bikin, êdî di mizgefta xwe de bimîn (mizgefteke wî li ber deriyê malê hebû), me ji bo kurên te mehaneyek diyar kiriyê, û ji bo te jî her mehekê du dînar (pêre) û hinek ard, û tu jî di mizgefta xwe de be. Hemedat got: Mîro! Ezê weha bikim. Bi rastî jî weha kir. Piştî kurtedemekê hat ba mamê min û gotê: Mîro, bi navê xweda nikarin di malê de rûnim, kuştina min li ser piştê hespekî ji mirina nav nivînê xweştir e. Mamê min gotê: bila wek ku tu dixwezî be.*

Hindik roj derbas bûn, serdarê xaçeperstan, ku serdarê Terablîsê bû, da ser me, xelk, û Hemedat jî vêre, raberî wî bûn, Hemedat bervê xwe da qubleyê û li ser sewkiyekê rawesta, û siwarekî xaçeperstan ji hêla roava de da ser wî. Hin hogiran bang kirin: Ey Hemedat!. Gava Hemedatî zivirî, û siwar dît, serê hespê xwe rakir, û rîma xwe girt, û avête wî, di sîng de çikand, siwarî yê ku bi qirika hespê xwe de daleqandî û li ber mirinê, bi paş de vegeriya û şer rawesta. Hemedatî gote mamê min: Mîro! Eger Hemedatî di mizgeftê de ba, kê yê ev ladan li wî bida”(24).

Usame Bin Munqêz, di nûçeyêke din de, wêrekiya siwarekî Kurd salix dide, û dibêje: *“Rojekê ji rojan, em ji Şeyzerê (kelehek li kêlek bajarê Himsê li Sûriyê ye) çûn niçirê, mamê min, rehme lê be, û leşkerin jî bi me re bûn. Gava em ketin nav daristanekê, da niçira perendeyan bikin, şerek derket pêşiya me.*

Mêrekî Kurd, ku navê wî Zehredewle El-Qubrisî bû (Ji bo nazikiya gewde weha hatibû navandin), yekek ji siwarên misilmanan bû, şêr da ser wî, ew jî ji ser hespê xwe ket, gava li erdê bû, û şêr hate ser wî, hema wî lingên xwe ber bi şêr de dirêj kirin, û şêr jî ew xistin devê xwe de, lê me da ser şêr û ew kuşt, û Zehredewle jî rizgar kir. Me gotê: Çima te lingên xwe xistin devê şêr?. Got: Wek hûn jî dibînin, gewdeyê min jar û lawaz e, min cil û sol li xwe kirine, min gote xwe, êdî ezê şêr bi van tiştan, beriya ku bigihîne parsû, an dest û seriyê min, mijûl bikim, heya ku xweda çareyekê dibîne. Hişê evî kesî, di kêlikên ku hişê te de wenda dibin, li serê wî bû”(25).

Tevî ku Talankerên Mongolan sawa mezin xistibûn dilên gelan. Dema ku Holako Xan ji bo dagîrkirina Bexdê tev digerî, û gêrkirina keleha Hewlêrê spartibû serdar Erqyo, wî jî demekê keleha dorpêç kir, û alîkariya leşkerî ji dostê xwe Bedredîn Lolo; sedarê Mûsilê (kesekî ermenî bû ji ebebozên

Silcoqan) wergirt, lê Kurd berztirîn nimûneyên wêrekiyê li hember wan diyar kirin. Reşîd El-Hemezanî dibêje: *“Şevêkê ji şevan, xelkên keleha dan ser Mongolan, her Mongolê ku dîtin, kuştin, menceñiq şewitandin, û vegeriyan keleha. Gava Erqyo ji hêz ket, Bedredîn Lolo anî ba xwe û pê re şewirî, wî jî got: tevdira kêrhatî ew e, ku tu vî karî heya havînê bihêlî, ji ber ku Kurd ji ber germê baz didin, û diçin çiyar, lê nûka heyam naverast e, û cebilxaneya wan dagirtî ye, û keleha jî zor parastî ye, tenê bi dek û pilanan wê bête gêrkirin”*(26). Pêre jî pilana Bedredîn bi ser ket, û di havînê de, piştî Kurd derketin çiyar, Mongolan keleha Hewlêrê gêr kirin.

Sala (657 k /1259 z) Teteran dan, bi serperştiya Teymûrling dan ser Bakurê Kurdistanê, lê tevî ku ewana bi kotekiyê navdar bûn jî, Kurd bi wêrekî ber xwe dan. Ibin Erebaş dibêje: *“Tevî ku cengên Teymûr pir bûn, û ew jî baş tevdirgeriya, û ziyar negîha leşkerên wî, lê tenê sê kesan ziyana giran gîhandin wî û leşkeran....yek ji wan sê kesan Ebo Bekir ê Şasbanî bû, yê din Seyyid Elî yê Kurd bû, û yê sisîyê jî Emet ê Tirkmen bû”*(27).

Lêgervanê ermenî; Arşak Safrastiyar, Kurd bi gelê wêrek û çalak salix dide, û dibêje: *“Her wêrekiya tekekesî û serkeftina cengewerî li ba Kurd nirxîha ne”, û ji bo Kurdên êzdî yên Şengalê jî dibêje: “Hemî gerokên ewropî, yên ku li gel êzdiyên Kurdistanê û Ermenistanê têkildar bûne, bi şeweyê erzankirinê li ser vî gelê wêrek axifîne”*(28).

Li destpêka sedsala bîstem, gava serdarê Azerbeycanê, yê farisî, Cewher Axa (birayê Simko) serokê êla Şikak xapand, û vexwende seraya xwe û bi xinizî kuşt, Mînoriskî wêrekiya hevalrê û parêzerên Cewher Axa salix da û got: *“Eve ye, wêrekiya Kurd ya bê hemta, eve ye şeweyê wan, vê lomê her kesê ku dixwezae li rûwê wan derkeve, divê hezar carî li tevdirên xwe miqate be. Ne ji xwe berê Faris û Tirk meteloka erebî, ku dibêje: (Kurd gurûpekî cina ne) dubare dikin”*(29).

Jêder û çavkanî:

- (1) Hêrodot: Dîroka (tarîx) Hêrodot, rû 103 – 104.
- (2) Nîkîtin: Kurd, rû 139.
- (3) Mînoriskî: Kurd, rû 61.
- (4) Nîkîtin: Jêdera berê, rû 101, 187, 224.
- (5) Cemal Reşîd: diyarbûna Kurd di dîrokê de, 2/15. Nîkîtin: Jêdera berê, rû 45, not 3.
- (6) Diyakonov: Med, rû 259.
- (7) Diyakonov: Jêdera berê, rû 412. (Xeşyarşah şahê Faris Îczersîsê yekem, kurê Darayê yekem bû, bi navê Exşewîrş jî dihate naskirin, û di navbera salên (465-435 b.z) li ser text bû.
- (8) Ibin Betote: Geryana Ibin Betote, rû 251.
- (9) Ibin Hecer El-Esqelanî: Tebsîr elmuntebêh bî tehrîr elmuştêbêh, 3/1213.
- (10) Şerefxanê Bedlîsî: Şerefname, 1/59.
- (11) Di jêderên îslamî de tê ser zimên, ku Keyqubad damezrênerê dewleta Kiyânî ye. Lê tiştê te bawerkirin ew e, ku Keyqubad bi xwe Diyakowê Med e. Dîrokzan ji bo ku dîroka Med wenda bikin, navê dewleta Kiyânî bi ser dewleta Med ve kirine, û ew wek dewleteke Farisî hejmartine. Biner: Dîroka tewaw / El-kamêl fî Ettarîx, 1/377 ya **Dumayî li RûPelê (14)**

Can kurd

Tiravêjan

Hozanvan û pêdakirina fantaziyê

[Ev Gotar Diyarî ye bo hozanvanê hêja Nezîr Palo]



Sigmund Freud (1856-1939)

Zanayê navdar Sigmund Freud dibêje, ku di her mirovekî de hozanvanek heye, û hozanvanê dawiyê bi mirina mirovê dawiyê re diçe.

Ew dipirse, ma wê ne çêtir be, em li rêç û şopa hozanvanê pêşîn li ba zarok bigerin? ji ber ku zarok bêtir ji lîskê hezdike û xwe bi lîskê re gêro û mijûl dike. Ew ji xwe re, wek hozanvan cîhanekê avadike, an em rast bêjin, ew heyînên cîhanê ji xwe re li gor hezkirina dilê xwe, di cîhanekê di ya nûjen de datîne, hema naye wê wateyê ku ew lîska xwe bê cediye dilîze, ew ji dil de dilîze û acetên lîska xwe, wek tiştên berbiçav ên rojane dibîne, ji rastîniyê ve, tevî ku di fantaziyek xort de ye, bi dîr nakeve.

Ciyawazî di navbera hozanvan û zarok de, di pêdakirina cîhana xwe ya fantaziyê de nine .

Hevmaliya zimanê helebestvanî û yê lîska zarok jî her maye, û hozanvan peyvên wilo bi kar tîne, ku "lîsk" têde ne. Sigmund Freud sê peyvên wêjevanî yên girîng: "Lîska evîni", "Lîska şîniyê" û "Lîskvan" wek nimûne tîne zimên.

Zarok mezin dibe û "Lîsk" her bi wî re mezin dibe, her di hindirê wî de dimîne, lê ji ber ku pêwîste ew dev ji wan "Lîskan" berde, bi wî re xemgîniyek navxweyî pêda dibe, êdî ew lîska xwe di "henek û yariyan" de dibîne. Ji lîska bi tiştan diçe ser lîska bi peyv û wateyan. Li vir nema ew bi acetin berbiçav û di nav destan de dilîze, ew ziman, peyv û bêjeyan bi kar tîne, hema ew her dimîne "Lîskvan" û ji cîhana fantaziya xwe dernakeve, bêtir firehtir dike, li ser wê şeweyekî taybet ji peyvdariyê pêda dike, û bi wê yekê dilşad

e û kêfa cane wî mezin e. Ewê mirov baş dinase, dizane ku mirov nikane bi asanî dev ji wê kêfê berde, ew kêfa ku di "lîskê" de dîtiye...

Zarok fantaziyên xwe yên di lîskê de pêda dike, çî bi tenê xwe be û çî bi hogiran re be, ji kesî fedî nake û venaşere, hema mirovê gihîştî fedî dike, wan fantaziyên xwe ne wêre aşkere bike, ew bi gelek çêrok û wêne û listikên wêjevanî dipeçine,

bi tabloyek, ku pir caran nafêhmkirî û "Soryalî" dide der û belav dike.

Di hiş û dilê zarok de, yek daxaz her heye, ew bibe mîrekî gihîştî û gir, karibe her tiştêkî bi xwe bike. ev daxaz wî dilivlivîne û di lîskê de ber bi avakirina cîhana fantaziya xweyî ve kaş dike. Li ba kesê zarotî li paş xwe hêştî, daxazên bi cih nehatîne dibin motora livîna wî ya fantaziyanê, hezkirina keçekê, ku neçûye serî, dikare wî rake balaxaneyek fantaziya bê wekanî.

Fantaziyek di nêv sê deman de digere an difire: Niha, berê û dema li pêş. Mirov tiştêkî, bûyereke an kesekî dibîne, yekser tiştêk, bûyereke an kesek di dema berê de tê bîra wî, an daxazek bi cî nehatibû, fantaziya mirov wî dibe dema li pêş û rewştek pêjîni "xeyalî" ji xwe re pêda dike, cîhanek fantaziyê, ku têde ew daxaza di dil de maye bi cîh tê...Divê em tîkiliya fantaziyê bi lîskê re hîç ji ber çavan wînda nekin.

Tiştêkî di yê balkêş di vê fantaziyê de heye, ew jî kesaniyek serekî e, weku dixuye ji aliyê hozanvan û çêrokvan ve, her tê paristin, û bi hemî hêza xwe bizavê dike, ku em ji wê kesaniyê hez bikin.

Di fantaziya hozanvanan de, tiştêkî ku em bi destan dihîsin an bi çavan û guhan dibînin û diguhin, dikare bibe nişana kesaniyekê an ciyê wê kesaniyê di helbestê / berhemê de bigire, gul û heyv di gelek stran û çêrokan de ciyê dilberê digirin. Li ba Shakespeare, di "Bazarganê Vênîsiya"(*) de, her kesekî ku tê destê Porziya dixwaze, pêwîste sandiqekê ji sê sandiqan hilbijêre, yek zêrî, yek zîvî û yek qurşîni ye.

Di yekê ji wan de wêneyê Porziya heye, yên di vala ne. Şehzadeyê Marokî ya zêrî hildibijêre, vala derdikeve, şehzadeyê Arragonî ya zîvî hildibijêre, ew jî vala derdikeve, hema hezkirîyê Porziya ya qurşîni hildibijêre, di wê de wêneyê dilbera wî heye û wê li xwe mardike. Her yek ji destxwezan berî sandiqa xwe veke di cîhana xwe ya fantaziyê re digere û egeran bo standina biryara xwe dibîne.

Sigmund Freud dibêje ku Shakespeare ev çêroka sê qutîkan ji "Gêsta Romanorum" biriye, ew berê di nav mirovatîyê de hebûye, lê sê keçikan di "Gêsta Romanorum" de dixwastin kurê Qyser ji xwe re

bistînin. Tiştê balkêş ewe, ku Shakespeare carek di di "Şah Lîr" de, li vê listikê vedigere, gava şah ji bo hersê dotên xwe dibêje, ku ya bêtir ji wî hez bike, wê dêrîna "mulkê" xwe ji wê re bihêle û ewa ji wî hez neke û bihayê wî nizanibe, êdî ne dota wî ye û mafê wê di dêrîna wî de tune ye.

Herdu dotên şah, Goneril û Rêgan para xwe bi hezkirina bavê xwe distînin, lê Kordêliya "Cordelia" bê par dibe. Li ba S. Freud sê kesani yên ji hev cihê, sê jinên ne wek hev di hersê berhemên mirovî yên giranbûha de tîr berçavkirin, hema her carekê bi şeweyekê, li gor fantaziya hozanvan / berhemdar û lîsk her dimîne ew lîsk. [Di efsaneyên kurdî de jî, sê bira an sê xûşk hene.]

Di efsaneya Girîkî "Yûnanî" de jî pêwîste Parîs jî ji nav sê xwedîkan yekê hilbijêre. Ev lîska mirovî fantazîkirina viyan û daxwazan, ku bi şeweyin wêjevanî yên carina baş û bêmirin, ji aliyê hozanvan/ çêrokvan ve tîr pêdakirin, li ba S. Freud tev li bîranên zarotîyê dibin, bi gelek çarîkan mirovatî zarotîya xwe dipeçine û pêşkêş dike, wekî kûzikên ku ji heriyê tîr pêdakirin, her yek şeweyekî distîne, lê di binyada xwe de tev ji yek gola heriyê ne...

[Emê carek di bîrê ser vê mijarê...]

Hûn bimîn di xêra Xwedê de .

(*) Li wergerandina me ya bi Kurdî binêre .



Freud û keça wî Anna

FEQIYÊ TEYRAN



(1590-1660)

Jînenîgarî û tiştin din

Yek ji helbestvanên mezin ên kurd e.

Perçeyek ji meqele "Klasîkên me – an sahir û edîbên me ên kevin" ya Celadet Alî Bedîrxan: Melayê Jaba di heqê Feqehê Teyran de gotiye: Sahirê siyê Feqiyê Teyran e ko navê wî Mihemed e. Eslê wî ji qesaba Miksê ye, welatê Hekariyan e. Di tarîxa heft sed û diwê peyda bûye. «Hikayeta şêxê Senhanî» û «Qiseya Bersîsayî» jî mewzûn gotiye û «Qewlê hespê reş» jî wisanî mewzûn gotiye û zehf beyt û eşaar jî qewî mileme û rengîn gotine. Û navê wî jî di sihrê da «Mîm û Hey» e, û miqdarê heftê û pênc salan emir kiriye û di tarîxa heft sed û heftê û heft da merhûm bûye û li Miksê jî medfûn e.

Gelo Feqiyê Teyran kî bû ? û navê wî çi bû? Ji ber ko Feqiyê Teyran leqeba şahir e û ne navê wî ye. Ji eserên wî «Wesfê şêxê senhanî» nik min heye.

Yê ko ev nîsxê nivîsandiye di dawîya wê de bi erebî gotiye: «Qesîda wesfê şêxê senhanî ya ko Mîr Mihemed nezim kiriye tamam bûye, Ev mîr Mihemed bi navê Feqiyê Teyran meşhûr e» Li gora vê serhê Feqiyê Teyran mîr bû û navê wî Mihemed bû. Lê mîrê kîjan welatî ? Heye ko ji mîrekên Miksê bi xwe bû. Ji eserên Feqî min jî «Wesfê şêxê senhanî» pê ve tu jî ne dîtine. Ji xwe esera «Qiseya Bersîsayî» bi guhê min ve jî ne bûye. Min navê «Qewlê hespê reş» bihîstiye . Bawer bikin jê re «Hikayeta hespê reş» jî dibêjin. Min hin xezel û qesîdeyên wî ên peregende jî dîtine .

Dibêjin ko Feqiyê Teyran şagirtê Melayê Cizîrî bû û li ber destên wî xwendîye.

Feqe di wefata Melê de jê re mersiyekek jî gotiye û li tarîxa wefata Melê tê de bi ebcêde îşaret kiriye . Ew mersiye bi destê min keti bû lê di dema nivîsandina vê bendê de ne bi min re ye. Lê qenc tête bîra min ko Feqe di mersiya xwe de dibêje:

«Heft eyn û lam ji hev bûn cida, şîn û girî dîsa tê da» .

Heke mirov ev pirsên ha bi hesabê ebcêde hel kir bawer bikin tarîxa wefata Melê jê xuya bike. Dîsan ji wê qesîde tête zanîn ko Melayê Cizerî ji gundê Hêsetê ye. Ji ber ko Feqe dibêje:

Îro werin, lazim werin, cîran û xelkê Hêsetê .

Herçî «eyn û lam» Feqeh qala van her du tîpan di «Wesfê şêxê senhanî» de jî kiriye û gotiye: Miksî ji wê meymestihê

Tewîl diket hikayetê

Miksî ji eşqê sihtiye

Ev sihir vi şêx ve nihtiye

Halê xwe tê de guhtiye

ji »eyn û lam« a hicretê

Feqe qala nefsa xwe bi xwe dike, Herwekî me got Feqe ji welatê Miksê ye, Lê gelek li Cizîra Botan maye û tê de xwendîye. Gelo leqeba Feqê Teyran çawan bi vî şahirî ve bûye. Dibêjin ko Feqeh bi zimanê teyran dizanî bû ji lewre navê Feqiyê Teyran lê kirine.

Di vê babetê de min ji şêx Evdîrehmanê Garisî çîroka jêrîn bihîstiye, Feqiyê Teyran diçû Cizîrê . Bi rê ve rastî keşekî hat; pev re hevaltî kirin. Midekî çûn , westiyan, xwe dan ber siha darekê. bihna xwe didan. Du çûk hatin û veniştin ser darê. Çûk pev re diştexilîn û Feqe dikenî . Keşê ji Feqe pirsî û got ê:

Ma tu çire dikenî ? Feqe got: Ev adeta me ye, em Feqe holê dikenin. Keşe: Divêt jê re sebebê hebe, mirov bê sebeb nakene. Feqe: Xebera te ye, lê heke min ji te re got, ditirsim tu bêbextiyê li min bikî û belakê bîni serê min. Keşe soz da yê ko nabêje tukesî. Feqe rabû mesela xwe jê re qise kir û got:

Ez bi zimanê teyran dizanim, tu van çûkên ser darê dibînî, yekî ji ê din re dibêje, ev feqiyê ha diçe Cizîre, lê nizane ko li Cizîrê serê wî dê bête êşandin. Keşe deyn ne kir, her diwan da xwe û ji nû ve bi rê ketin, gava ghiştin Cizîrê Feqe çû Medresa Sor, keşe çû Westaniyê .

Li Westaniyê xelk giha bûn hev û wek mirovine ko li tiştêkî digerin diçûn, dihatin û li erdê fedikirîn û dipeyivîn. Keşe sehîti kir û zanî ko remildarekî gotiye ko di erdê Westaniyê de xezîneyek heye, lê nikarî bû cihê wê şanî bide. Mîrê Cizîrê jî li xezîne digere. Vê carê, keşe kenî û çû nik mîr; mesela feqe û çûkan jê re got. Mîr şande pey Feqe.

Feqeh gote mîr; belê ezê xezîne derînim, lê para xwe jê dixwazin. Mîr jî şertê Feqeh pejirand, yanî qebûl kir. Feqe jî çû hinek zad anî û reşand nava Westaniyê, û xwe li paş kevirêkî veşart.

Teyr hatin ser zad, zad xwarin û bi hev re ştexilîn, Teyrekî ji yekî dîtir pirsî:

-Ma kê ev zad reşandiye vê derê?

- Feqiyê Teyran ev zad reşandiye, seba xezîne.

- Ma tu nizanî xezîne li ku ye ?

- Belê dizanim, sibehî westê roj hiltêt kevirê ko tavê berî ewilî lê didit xezîne di bin wî kevirî de ye.

Feqeh zivirî medresê û nivîst, sibe zû rabû çû Westaniyê û piştî ko kevirê xwe nas kir berê xwe da mala mîr û gote wî: Ezbenî min xezîne bi cih kir. Mîr digel xulaman rabû, hat Westaniyê, erd kolan û xezîne derêxistin. Malekî zehf derket .

Mîr ji Feqe pirsî: Para te çi ye bêje...Feqeh got:

Beramberê serê keşê bidin min. Mîr got: Serê keşê bi laşê wî ve ye, em çawan beramberê wî bidin te. Feqe got: Rahet e, serê keşê ji laşê wî vekin.

Anîn serê keşê jê vekirin û danîn ser sehîne û li milê din hêdî hêdî zêrê xezîne êxistin, hetanî ko zêr tamam bûn.

Zêr beramberê serê keşê ne hatin, Mîr enirî û gote Feqeh: Te zanî bû ko serê keşê hinde giran e, ji lewre te ev şert bi min re kir.

Feqeh deyn ne kir, zêr ji sehîne rakirin û çend kulm ax avêtine şûnê . Milê axê daket, serê keşê rabû, hingê Feqeh berê xwe da mîr û got ê:

- Mîr im, min zêr navêt, zêr ji te re divêtin, tu ko xwedî xulam û mêvan î. Mexseda min ew bû ko ez şanî we bidim ji serê insên girantir ax heye, û insan bi tenê bi axê têr dibe.

Ev her sê şahirên ha yanî Elî Herîrî, Melayê cizerî û Feqiyê Teyran bivê nevê beriya Ehmedê Xanî ne. Ji ber ko Xanî qala wan dike û dibêje:

Min dê elema kelami mewzûn
Alî bikira li banê gerdûn
Bînavê riha Melê Cizîrî
Pê hey bikira Elî Herîrî
Key fek we bida Feqiyê Teyran
Heta bi ebed bimaye heyran
Çi bikim ko qewî kesad e bazar
Nînin ji qimas re xerîdar

Ezê niho hin şihîrên Feqiyê teyran bidim zanîn . Ji Wesfê şêxê senhanî:

Van qisetan izhar bikim
Behsan kar û bar bikim
Yar û biran hişyar bikim
Da ez ji şêx dim wesfekî
şêxek hebû çaxê ewil
Nûrha Xwedê hel bû di dil
Sed gumreh û dal û midil
Bi destê wî tîn tobetê
şêxek hebû sinhaniyan
Serdarê pansed sofîyan

Bi kurfî naveroka Şêxê Sen'an

'Şêxê Sen'an' an jî 'Şêxê Senaniyan' yek ji berhemên Feqiyê Teyran e. Berhem li ser şêxekîye ku wekî Şêxê Sen'an tê danasîn.

Şêxê Sen'an yê herdem di zikr û taeta Xwedê de serdarê 500 sofîyan e. Kar û xebata Şêx tev ji bo axretê ye. Elaqê wî qet ji xweşî û lezetên vê cihanê tine. Ew ewliyayekî Xwedê ye. Şêx tîn ser ji bo ku baş bibin, kor tîn cem ji bo ku bi çav bibin, dîn tîn cem ji bo ku saxlem bibin. Feqiyê Teyran kesayetîya Şêxê Sen'an bi van rêzikan tîne ziman.

Dûr bû ji ev dinya fanî
Pir digrî kê mîr dikenî
Kul bû ji ber secdê enî
Di karê zewada axretê

Wî her zewade kar dikir
Zikrekî bê hejmar dikir
Ji dinyayê istixfar dikir
Dûr bû ji her ci sibhe tê

Temenê Şêx dibe 77. Sofî li hev dicivin û biryara çûna Hecê dikin. Şêxê Sen'an wekî rêberê karwanê 500 sofî tê hilbijartin û dikevîne riya Hecê de. Karwanê Hecîyan li nêzikê bajarê Tiflîsê, ji bo bêhdanê li baxekî rûdinin. Ev bax baxê qîza hukumdarê Gurcan e. Çavên Şêx di vî baxî de bi qîza Gurcî dikeve.

Piştî ku ew qîzê dibîne biryar dide ku li vira bimîne û xizmeta keça Gurcî bike. Sofî dikin nakin bisernakevin ku Şêx ji biryara wî vegefinin, ew mecbûr dev ji Şêxê xwe dibêrdin û bê rêber divegerin warê xwe.

Şêx li xwe nakit sitaran
Eşkere xwe gote yaran
Ax ji destê dohta kufaran
Bimre dînê şirketê

Bê mezheb û bê dîn kirim
Bê xwendin û yasîn kirim
Ji yar û biran şermîn kirim
Werdek xeyala min ne tê

Lew nesîm werdan bixwûnim
Bejneke nazik dibînim
Dîn dibim wer dimînim
Dil ji min bir qametê

.....
Şerm û edeb çû wê demê
Nalî ji tîra sertemê
Bûye kenîne alemê
Avêt kirasê rûmetê

Şêxê 77 salî, yê di riya Hecê de bi hêviya ku keça Îsawî îşaretekê bidîyê dev ji her tiştî dibe. Dema Şêx ji qîza Gurcî re evîna xwe diyar dike, qîz xebera dawî jê re dibêje: Eger Şêx bibe Îsawî ewê mecal bide ku ew hevûdin bibînin. Şêx hemû şertên keça hukumdarê Gurciyan ya xiristiyî qebûl dike. Ew Şêx ewliyayê Xwedê, rêberê karwanê Heciyan di 77 saliya xwe de dest bi vexwarina meyê dike û dibe gavanê berazan. Şêx serpehatiya xwe wiha tîne ziman:

Hem no kirim, hem bed kirim
Ku ewê ez Îsawî kirim
Ji vê terîqê der kirim
Kafir kirim bê murwetê

Kafir kirim meyxur kirim
Dîwane û epter kirim
Balekê ji pêxember kirim
Ev reng bela li ser min tê

Sofiyên mirîdê Şêx di dawiyê de ji warê xwe cardin tî û Şêx bi xwe re dibin. Qîza Gurcî jî li dûv Şêx diçe, lê dema ku ew di gihîjin hev Azrayîl ruhê herduyan distîne û ew bi bihiştê tî xelatkirin.

* * *

Dil ji min naket xeyalan
Bûme perwana şemalan
Bêriya husn û cemalan

Ay dilê min ay dilo
Can ferît im te nabînim
Deftera îşqê bixwûnim
Serxweş û sukran û dîn im

Ay dilê min ay dilo
Serxweş û sukran û mest im
Efa'lê eswed digestim
Sebr û aram çûn ji destim

Ay dilê min ay dilo
Sebr û aram û sikon e

Ay dilê min ay dilo

Baziyê nav lê 'uyon e
Dil ji pencan kirbû xwon e
Ay dilê min ay dilo
Bazê me krî sikince
Girtibû ez bi her du pence
Min mûdan dil jê bi renc e

Ay dilê min ay dilo
Hêstirim barîn ji xwînê
Sotim ez derdê evîne

Kes ji min neket yeqînê
Ay dilê min ay dilo

Dax û kovan bê hesab in
Mihnet û eys û ezab in
Xem ji qelbê min venabin
Ay dilê min ay dilo
Van deman yek carî xwarim
Dîn kirim dîne bi har im
Agirê îşqê bijarim

Ay dilê min ay dilo
Agirê îşqê û pêt e
Her kesê dê kes navête
Demekî naket tebête

Ay dilê min ay dilo
Demekî naket qerar e
Şev û roj ahî û zar e
Ez xelas bûm bûme dar e

Ay dilê min ay dilo
Rey û tekbîrim xilas bûm
Zilfê çokan çep û rast bûn
Gelew kazin bê qiyas bûn

Ay dilê min ay dilo
Sîne ey hubê herîşte
Bi agirê îşqê birîşte

Qet li min nayên nivişte
Ay dilê min ay dilo
Sîneya hubê sidûr e

Dax bi dil kovan û kûr e
Wan hemiyar dil ji nûr e
Ay dilê min ay dilo

Wan hemiyar agir di nav bit
Min ji daxan dil zirav bit
Bê hesab şîşe di nav bit

Ay dilê min ay dilo
Bê hesab şîşe lê kişande
Hûr kiro misk lê reşande
Nezera zer şeh veşande

Ay dilê min ay dilo
Nezera sahib nezîra
Teşbihê berqê di şîra
Dame ser gezmê di tîra

Ay dilê min ay dilo
Gezmeyan carek hinavan
Hûrtira ejnû û nûgavan
Tarûmar kirbûn ji gavan

Ay dilê min ay dilo
Tarûmar kir can û cism e
Pisyar in cîran û xizme
Ev xizmet babet tilisme

Ay dilê min ay dilo
Mîm û hê wesfê xwe hilda
Xweş mîsal in çûn di cilda
Cerh û kovan çûn di dil da
Ay dilê min ay dilo

Qesîdeke wî:

Bizan ko min yar ti wî

Dil ji birîndar ti wî
Ez kuştim yekcar ti wî
Çi bikim ko min yar ti wî

Bê dest û hem pa ti wî
Pir li min kubar ti wî
Ê b'xezeb xwendî ez im

Di qeyd û bendê ez im
Zencîr bi zendê ez im
Mistaqi rindî ez im

Aşiqê cindî ez im
Perwazi fîndê ez im
Xweş qed û ehla ti wî

Cama piyala ti wî
Sûx bejn û bala ti wî
Delala mala ti wî

Pir bext û tala ti wî
Nîmeta ala ti wî.
Dûr ji wisalê ez im

Yar di xeyalê ez im
Îsa li erdan ti wî
Bi girt û berdan ti wî.

Qesîdeke dîn ji qesîdeyên Feqe

Guh bidêrin niqtê aşiqan
Da ez bixûnim vê xetê
Hemd û senaya xaliqê
Sibhan ji şahê qudretê

Sibhan ji şahê zulcelal
Fikrê me neqşê bê zewal
Halê bê micaz na ête bal
Kamil dibin bi ulfetê

Kamil dibin ev rengê bela
Sed mift Şêx mela
Ew li sîrrê bin mibtela
Ji neynika eksîteyê

Dunya ji kesîre namîne

Ne Şê ma ne Nûh ma
ne Yûnis ma ne Curcîs ma
ne.....

Ne Eyûbê birîndar e
Ne calînos û Suqrat ma
ne Tatalîs û Yeqrat ma
Ne Zulqurnenîn û Mir`at ma
ne cum-cum ma ne ixbar e

Di derbarê cugrafiya dunyayê de

ev dunya berê av bû
xwelî tede ne xuyabû
av miçiqî xwelî mabû

Jêbir:

- 1- navkurd de
- 2- ku .wikipedia . org
- 3- Dîroka wêjeya kurdi- Feqî Huseyn Saniç.

Bîranînên Têkoşerekî Kurd

Ehmedê Ebdirehman Axa Kurê Şahîn Axa Şûzî ...

Xelek – 5 –



Em derbasî hundir bûn, piştî bihekî bû çaxê fîtarê, xwedê mala kurdên wekî wî avabike, xwarinek gelek xweş ji mere anî, ji demekî başve me wek wê xwarinê ne xwaribî.

piştî xwarinê Şêx bi hêdî ji minre got, birazî xwiyaye mîvandariyê me mirovekî başe, tu vê carê jêre bêje, mi berê xwe da Şêx muhyedîn, mi got:

Em gelek kêfxweşin bi dîtina te, Mele Mistefa reşbelegk ji tere nivîsandibû, lê xwedê mala hineka ava neke, berê me da cem Şêx Hacî Mistefa, em bê hêvî ji cem wî derketin, û me berê xwe da te, û fermo reşbelega Mele Mistefa.

Camêr ji beriya reşbelegê bixwîne got hatina we li ser çavan, û piştî reşbeleg xwend got ez di bin alîkariya milletê xwede me, hûn û seydayê me Mele Mistefa li ser seran û çavan, û li ser me sitûbare em arî webikin.

dema me gotinên vî Şêxê hêja bihîstin, me teva li hev nerî bi rûnî girmijîn, û Şêx Ebdirehman spasiya wî kir, û got:

Şêxê delal, em dixwazin herin bajarê Silêmaniyê cem xalê te Şêx Mehmûd ê Berzencî, û em bi hêvîne kû tû alîkariya me bike da em bighine cem wî.. Şêx muhyedîn bakir kurekî xwe, gotiyê:

Em derbasî hundir bûn, piştî bihekî bû çaxê fîtarê, xwedê mala kurdên wekî wî avabike, xwarinek gelek xweş ji mere anî, ji demekî başve me wek wê xwarinê ne xwaribî.

piştî xwarinê Şêx bi hêdî ji minre got, birazî xwiyaye mîvandariyê me mirovekî başe, tu vê carê jêre bêje, mi berê xwe da Şêx muhyedîn, mi got:

Em gelek kêfxweşin bi dîtina te, Mele Mistefa reşbelegk ji tere nivîsandibû, lê xwedê mala hineka ava neke, berê me da cem Şêx Hacî Mistefa, em bê hêvî ji cem wî derketin, û me berê xwe da te, û fermo reşbelega Mele Mistefa.

Camêr ji beriya reşbelegê bixwîne got hatina we li ser çavan, û piştî reşbeleg xwend got ez di bin alîkariya milletê xwede me, hûn û seydayê me Mele Mistefa li ser seran û çavan, û li ser me sitûbare em arî webikin.

dema me gotinên vî Şêxê hêja bihîstin, me teva li hev nerî bi rûnî girmijîn, û Şêx Ebdirehman spasiya wî kir, û got:

Şêxê delal, em dixwazin herin bajarê Silêmaniyê cem xalê te Şêx Mehmûd ê Berzencî, û em bi hêvîne kû tû alîkariya me bike da em bighine cem wî.. Şêx muhyedîn bakir kurekî xwe, gotiyê:

lawo, here cem Mecîd, silavê min lê bike, û jêre bêje bavê min dixweze bi lez tu bê cem.. piştî dû çarîka Mecîd hate cem me, mecîd sîpekî şidiya bû, silav kir û çû destê Şêx muhyedîn maç kir, bi dûre destê me teva hejand û rûnişt.. Şêx muhyedîn berê xwe dayê û got:

Mecîd, birazî, sibehê zû piştî mêjê tû tirumbêla xwe bînî vir, û van her çar peyan siwarkî, wan bighînî



Silêmaniyê cem mala xalê min, lê bi rêde tu li tukesî nesekinî, ta şurte jî ji tere nîşan bikin, li wan nesekine... mecîd vegerand got ez di emrê Şêxê xwedeme.. Şêx muhyedîn 50 rupî kirin bêrika wî, û rabî çû.

Wê şevê ta melayê sibehê bang bide, baran nesekinî, wextê nimêjê mecîd hate cem me, û gote Şêx muhyedîn, rê herîye ji baranê tirumbêl nikare bimeşe, ez hêvî diki ji Şêxê xwe, kû çûnê bihêle sibe, ta hinekî erd zuha bibe.. Şêx gote bila, ka em tevde herin ser kaniyê, li wir em mêja sibehê bikin.

Dema em gihan cem rewana avê, piştî me mêja xwe kir, em ji xwere diştexilîn, bû nîzîkî heştê sibehê, Şêx muhyedîn gote fermo em herin malê nan bixuin, me da xwe em rabûn, bi rabûna mere me dît, reqîbek digel şeş şurtiya ve silam kirin, û destê Şêx muhyedîn maç kirin, yê reqîb gote Şêx, walî Şêx Ebdirehman û hersê hevalên wî dixwaze wan bibîne, Şêx muhyedîn gelek xemgîn bû, gote yê reqîb, ev çi hikûmetik ne başe, nahêlê Derwêşek herê cem meşayixên xwe, yê reqîb gote bi Erebi "وما على الرسول إلا البلاغ" lê ezê ji tere bêjim, yê mîvanê te çûbûn cem, wî gilhê wan kiriye, û te divê wan rêke yan rêneke... Şêx got, em zanin kurme darê jêye.. Me ji Şêx muhyedîn re got:

Xema nexwe, emê herin cem walî, ka çi dixwaze, û emê vezerin.. Şêx got ez di tirsim ev bê bav we bigrê, hûn ji ya min bikin ezê we veşêrim ta sibe hûn bi rê bikevin.. Şêx Ebdirehman gotiyê, em te nayêxin bin tiştinî nebaş walî bi tere bike, emê herin cem, binerin ka çi ji me divê, û xwedê kurdên pîs wekî Hacî Mistefa ji vê cihanê rake, çiyê wî cehneme be.

Em bi şurte re çûn cem walî, wextê em derbasî cem wî bûn, ji mere got:

Carina hûn li Sûrî ne, û carina hûn li Turkiye ne, û carina hûn li Îraqê ne, ev gera we ji bo çiyê?

Şêx Ebdirehman gotiyê:

Ev hersê suxteyê minin, û ez suxte Şêx Husamedîn ê Tewîle me, emê herin ba wî, berê ti sînor tunebîn di nav millet de, bav û kalên me diçûn cem hev,

tu kesî ne digote wan, çima hûn diçûn cem hev.

Walî got:

Ez dizanim hûn li çî digerin, û bakir yekî, gotiyê wan bibe gotinên wan bistîne.. Şêx vegotinê xwe yên li ber walî ne guhertin, em hersiyên din me yek vegotin got "em suxte Şêxin, û em pêre diçûn gundê Tewîle cem Şêx Husamedîn".. mixabin piştî vegotinê me nivîsandin, em xistin zindanê de..Çar mehan em hiştin girtî, Şêx Muhyedîn xwarin ji mere rêdikir.

Rojekî sibehê em ji zêndanê derxistin, em birin cem serdarê polis, ji mere got:

Bi fermana walî emê we rêkin Mûsil, divê hûn pera bidin kiriya rêya xwe.. Şêx kenî gotiyê:

Em peyanî derwêşin, tu pere bi mere nîne, we em girtine, û hûnê me rêkin, yan me berdin emê bi zanebûna xwe herin Mûsilê... yê polis girmijî û vezerand, em we bernadin, emê tirumbêlê ji were bigrin.. bakir peyak ji polis, destê me xistin kelebçan de, û em birin li tirumbêlekî siwar kirin.

Piştî hinekê, peyak ji polisê wir xwe nêzîkî pencera tirumbêlê kir, devê xwe bir û anî, û got bi erebî "derawîş, feşafîş, henafîş".. me berê xwe jê guhert, ewî jî hinekî xwe ji me dûrkir, min gote Şêx ew carekî dî bê tinazê xwe li me bike ezê lêxim, Şêx gote min, bîna xwe fireh bike.

Carekî dî ew peya hate serê xwe kir pencerê aliyê min, û disa wekî berê despêkir, hîn devê wî dilebitî, ta ji min hat bi herdû destên xwe yên bi hev re grêdaiyî min kulmek li rûê wî xist, û pêre min bi dengê bilind bankir, sayê kurê sa we em girtine û hûn tinazê xwe jî li me dikin.. Ew dûr ket ji me, li ser dengê min reqîbek bi lez hate cem me, û pirsî çî heye, min jêre got çima min lêxist, camêr got te başkir, ew gîşte mafê xwe, ban wî polisî kir û awirek dayê û gotiyê ji vir biqeste, ezê bi dûre qeşmeriyên te şanî te bikim.

Tirumbêla me bi rê ket, dû polis bi mere bûn, çaxê em gîştin Mûsilê, Em birin zindanekî piçûk li cem polis, gotin me, sibehê wê serdarê polis bê we bibîne... piştî dû roj me qedandin, roja sisiya em derbaskirin cem serdarê polis, ji mere got:

Emê we berdin, lê divê hûn yekî bînin bibe misuger di ber wede, yan hûn pera razînin ji misugeriya we re.. me gotiyê em kesekî li Mûsilê nas nakin bo misugeriya me, û tu pere bi mere nîne.. li me vezerand û got: rêya sisiya hûn misugeriya xwe bikin, lê divê hûn li ser pelna imze bikin, û îaxê hûn bê destûra, serdarê Zaxo bi dernave herin, emê şeş mehan we bêxin zêndanê, û winê 1000 ropî bidin, wextê hûn pera nedin, wê dema zêndanê pirtirbe ji were.

Em rabûn me li ser civatnamekî imze kir, reşbelegk jî dane me, gotin me hûnê vê reşbelegê bidin serdarê polisê Zaxo.. me rêya xwe girt û berê xwe me da Zaxo, me reşbelega xwe bi rêde vekir, tede nivîsbûn "Şêx Ebdirehman digel sê hevalên wî li Erbilê hatibûn girtin,Domahî li R.P(13)

Dr. Ehmed Xelîl (Sozdar Mîdî)

Pêşiyên Me Yên Arî – Zagrosî (Gelê Kaşo/Kaşu)

Çavdêriya zimanî: Mustefa Reşîd

Erdnîgarî û Nakokîya Gelan:

Napolyon Ponapart di gotineka xwe da dibêje: "Ramyariya gişt dewletan di erdnîgariya wan da ye"⁽¹⁾. Û dîroknasê inglîzî yê navdar Arnold Toynbî dibêje: "Erdnîgarî pertaleka pir nirxîha ye, û pertalên din gişkî xwe bi erdnîgariyê hildipesêrin"⁽²⁾

Bi rastî ev gotinan dîrokî ne, ku mirov bi paş guhê xwe da bavêje, ê qet rê nebe ser rasteqînan, û tu carî ê nikaribe bûyerên kevin û nû bi awayekî zelal şîrove bike. Erê, pêwîste her dem erdnîgarî di bala me da be, çimkê li ber ronahiya wê, ne bes sedemên nakokîyan, şeran, dogîşan, serhildanan û şoreşan xuyadibin, lê belê bi ser da jî damarên olan, felsefeyan û tiyoriyên civatî, aborî û ramyarî jî xuyadibin.

Başê, de werin em li ber ronahiyên van gotinan, nakokiyên ku qewimînî di navbera komnîfşa Arî (Aryanî = Indo-Ewropî) û komnîfşa Samî da şîrove bikin.

Gelên komnîfşa Arî evin: Kurd, Faris, Ermen, Gurc, Bilûc, Afgan, Pakistan, Hind û tevayî gelên Ewropî û yê ku ji wan li cihanê belav bûn. Pêşiyên gelên Arî berî 3000 b.z., li rojavayê Derya Qezwîn (başûrê Rûsya) dijîn, li rojhilatê wan gelên Toranî (pêşiyên Tirkan, Teter û Mongolan) dijîn.

Ji ber sedemên heyamî (atmosfêrî), pîrbûna jimara mirovan û dibe jî ku ji ber êrişên Toraniyan, hinek gelên Arî bi başûr da koçkirin (Afganistan, Pakistan, Hind), hinek jî ber bi rojavayê Asiyayê (Kurdistan, Farisistan), hineka din jî derbasî Ewropa bûn, û beşek jî ji wan bi keştiyan di Derya Sipî ra derbasî bakurê Afrikayê bûn, ewan pêşiyên gelê Emazîx (Berber) in.

Gelên komnîfşa Samî evin: Ekkadî, Amurî (Babilî = Kildan), Aramî, Ken'anî, Cihon, Erebi, û hin dîroknas Aşûriyan ji komnîfşa Samî dihejmêrin, hin din jî wan ji Ariyan dibînin, lê kultûra wan Samî ye, di vê babetê da, mamoste Mustefa Reşîd (çavdêrê zimanî ê van xelean), berî demeka kurt agahiyek ji min ra bi rêkir û da xuyan ku zanyarê almanî arşêolog Prof. Dr. Volker Haas (pîsporê Horîologî ye) dibêje: „Aşûrî ji zewaca di navbera Samî û Horiyan da pêkhatîye, piraniya gel di emperatoriya Aşûrî da Horî bû, û tenê çîna serdar, ji wê zewaca têkel bû“.

Pirên dîroknasan dibêjin Biyabana Erebi (Erebistan) kevintirîn erdnîgariya gelên Samî ye, berî 2500 sal b.z., hin ji wan ber bi bakur rojhilat (Mezopotamya) çûn, hinek din ber bi bakur rojava (Sûriya Mezin) çûn, û gelê Erebi di biyabana xwe da ma.

Pêşiyên me yê Arî- Zagrosî:

Bê guman di pêvajoya dîrokê da nakokî û cengên dîr û dirêj di navbera gelên Arî û gelên Samî da qewimîne, di her demê da erdnîgariya ku ew nakokîyan têda diqewimîn çiyayên Zagros, Mezopotamya û di pêra rojhilatê Derya Sipî (Sûriya Mezin) bû. Piştî sala 1000 z., gelê Toranî jî kocî Rojavayê Asiyayê kir, û bi zora şûr û di bin sîwana Islamê da gelek deverên Rojavayê Asiyayê dagîrkirin

dagîrkirin, û ta niha jî ew nakokî didomin: Samî bi serkêşîya Erebi û Cihûyan, Arî bi serkêşîya Kurd û Farisan, Toranî bi serkêşîya Turkan.

Helbet wê baştir be ku em li ber ronahiya van resteqînan bi bûyerên dîrokê ra bidin û bistînin, bi teybetî jî nakokiyên ku di navbera pêşiyên me yê Arî-Zagrosî û gelên Samî da qewimînî, çimkê tê xuyan ku piştî sala 2000 b. z., hinek gelên Arî ber bi rojava koç kirin, û gihîştin Çiyayên Zagros û derdora wê, û hin bi hin ew û pêşiyên me yê zagrosî tevlihevbûnek tevayî pêk anîn, (zimanî, çandî, mîtologî, civatî, aborî, ramyarî), û nijadekî nû (Aryan- Zagrosî) peydakirin, û tê xuyan ku şaxên Arî di wê nijada nû da bi hêztir bûn, û serdarî û fermandarî bi dest wan da bû, lewra jî wan şahnişîn ava dikirin, û ala serkêşiyê di çarçewa nakokîyan da radikirin. Ew gelên Arî-Zagrosî evan bûn⁽³⁾.

1 - Gelê Kaşo (Kaşu):

Kaşo bi navên (Kaşsu, Kaşî, Kîşî, Koşo, Kaşî, Kasay; Kasî) jî tên navandin, ew gela ji nijada Arî- Zagrosî peyda bûye û ev nav (Koş) ji xwedayê wan (Kaş/Kaşo) hatiye. Wateya wî jî (birêz/rêzdar) e. Erşak Savrasiyan dide xuyan ku cihê Kaşoyan pêşî li devera Loristanê bû, (başûrê Kurdistanê), û heye jî ku navê (Kaşo) di navê (Xoz / Xozistan) da mabe. Li devera Loristanê wê çaxê hem navdartirîn rîya bazirganiyê (rîya Herîr) têra diçû, û hem jî navdartirîn hespên cihanê lê dihatin tîmarkirin⁽⁴⁾.

Gelê Kaşo ji Kermenshahê heya bi rohilatê çemê Dîclê belav bûn, ewana bi siwariyê û xwedîkirina hespan navdar bûn, û berî pêşî ewana hesp anîn welatê Mesopotamya.

Li dor sala 2000-an b.z., Babil (li Mesopotamya) şahnişîna tewra hêzdar bû li Rojavayê Asiyayê, her dem êriş dajotin ser welatê Kaşo. Lê di pêra şahên Kaşo êriş birin welatê Babil, navdartirîn paşayê Kaşiyân di wê demê da **Candaş** (Gandaş) bû, di navbera salên (1741-1726 b.z) da homan (destlatdar) bû, û xwe bi navê (paşayê her çar warên cihanê) dida naskirin⁽⁵⁾.

Li derdora sala (1594 b.z.), an jî sala (1531 b.z.), Kaşoyan şahnişîna Bibil xistin bin destê xwe, û bajarê Babil (li başûrê Bexdê, bi 90 km) kirin paytexta xwe, paşê paşayê wan **Korîgalzowê duwem** (1354-1324 b.z) paytexteka nû, bi navê (Dor Korîgalzo) ava kir, ew paytexta jî nêzîkî Bexdê bû.

Kaşo navê (Kardonyaş) ango (welatê xweda Donyaş) li welatê Babil kirin, bi awayê mirovane li gel hemwelatîyên Babil desthilatî kirin, gelek awayên baceyê ji holê rakirin, û tîkiliyên aştî li gel welatên derdorê girêdan, bi teybetî jî li gel welatê Aşûr yê li kêleka wan, û tîkiliyên dostane li gel şahên (Fer'ûnên) Misirê girêdan⁽⁶⁾. û ti bicîkirin bi wanre tune bû, û bîrêrê sê mehan ketin zêndanê, mala wî li gundê Balqosê ye divê bê destûra Lê belê kêfa şahên Aşûr ji şahnişîna Kaşo



Domahiya Bîranînen Têkoşerekî Kurd

bê destûra we bi tuderave neçin”.. Me carekî di reşbelega xwe girt, û hinekê qermiçand, ji bo nizanibin me vekirye.

Dema em giştin Zaxo, wê rojê em razan û me xwe şûst, roja dî em çûne cem serdarê polîs, me reşbeleg dayê, piştî xwend gote me: Di baweriyê minde we ev reşbeleg xwendiyê..

Şêx kenî got belê me xwend, hima tede danîba wan bikuje, em ne dihatin cem te.. li me meyzand û girmijî, got ez dixwazim ji we hûn bi ti derave neçin bê destûra min ta dû mehan, ji wir û pêde hûn azad dibin.. me gotiyê bila lê rûniştina me li gundê Baleqosê ye.. gote me herin wir, me xatir jê xwest ji ber xuyabû peyakî baş bû.

Piştî dû rojê me qediyar li Baleqosê, bû cejna mezin, me cejna xwe li wir bihurand, roja dawî ji cejinê, Şêx Ebdirehman ji minre got, birazî sibe here cem serdarê polîs, jêre bêje bila destûra me bidê em herin gundê Çiftikê da em cejna Şêx Brahêm Heqî pîroz bikin.

Roja dî ez çûme cem serdarê polîs, mi jê xwest destûra me bide.. gote min çênabe hûn herçar bi hevre herin, bila dû peya herin û piştî veşerin, herdûê dî herin.. min hêvî kirin jê kû bihêle em herçar bi hevre herin, ewî destûr neda, mi jêre got, wekî em herçar herin bi hevre, tê çi bikê? girmijî û gote min, hûn herçar biçin herin, lê ez destûrê nadim.

Dema ez veşeriyam cem hevalan, mi ji ware got çî bi minre çêbî, Şêx gote me rabin em herin, me da meş bi nigan ta em gihiştin Çiftikê, em çûne cem Şêx Brahêm Heqî, gelek xemgîn bibû li ser me, me jêre çîroka xwe got, veşerand û got şukir ji xwedê re hûn bi silametî veşeriyar.

Roja dî Osman Sebrî destûra xwe xwest, û bi rê ket da herê Sûrî, rabû Şêx Ebdirehman gote Mistefa ê botanî, birazî, divê tû herê cem Mele Mistefa Barzanî, jêre çêroka me bêje, û ka ew çî dibêje, bi lez vegere vir, emê li benda tebin.

Osman Sebrî û Mistefa botanî, her yekî ji wan bi rêya xwede çû, û ez û Şêx mane li Çiftikê li benda Mistefa botanî ta ku ji cem Mele Mistefa Barzanî vegere

nedihat , her dem û bi her awayî hewldidan ku wan hilweşînin, û welatê Babil û deverên Çiyayên Zagros bixin bin destên xwe. Şahnişîna Kaşo derdora şeş çerxan dom kir, û desthilata wan li welatê Babil ne kêmîrî çar çerxan dom kir, dawitirîn paşayê Kaşiyân **Enlîl-Nadîn- Ahî** bû (1159-1157 b.z), û di pê wî ra, li dawî jî, şahnişîna Kaşo bû beşek ji şahnişîna Aşûr⁽⁷⁾.

Cêder:

- 1 - Gaston botl: *Hunera Ramyariyê (فن السياسة)*, rû 149.
- 1 - Arnold Toynbî û *Daysako: Rû bi rûtiyên mezin (التحديت الكبرى)*, rû 58.
- 1 - Ralf Linton: *Dara şaristaniyê, beş 2, rû 162. Bongard – Livîn: Tiştên nû li ser rojhilata kevî, rû 273. H. G. Welz: Nişanên dîroka mirovaniyê, beş 2, rû 308, 309.*
- 1 - Erşak Savrasiyan: *Kurd û Kurdistan, rû 41. Muhemed Beyyûmî Mehran: Dîroka Îraqê ya kevî, rû 298. Ehmed Fexrî: Lêkolînên dîroka rohilata kevî, rû 205.*
- 1 - Jin Potro û *hinekên din: Rohilata nêzîk, rû 211, 212, 571. Ehmed Fexrî: Jêdera berê, rû 203. Ebdil-Hemîd Zayid: Rohilata nemir, rû 571. Diyakonov: Med, rû 127.*
- 1 - Jin Potro û *hinekên din: Jêdera navborî, rû 173. Jênot Wilhelm: Horî, rû 56. Muhemed Beyyûmî Mehran: Jêdera berê, rû 305, 306.*
- 1 - Cemal Reşîd Ehmed: *Diyarbûna Kurd di dîrokê da, beş 1, rû 600. Tewfîq Sulêman: Jêdera berê, rû 320,321. Muhemed Beyyûmî Mehran: Jêdera berê, rû 307. Ebdil-Hemîd Zayid: Jêdera berê, rû 550.*

Hevpeyvînek.. LISER

GERYANA DI NAV ÊZDIYÊN ERMENISTANÊ DE



Kemal Tolan û Sedîqê Basî

▼ Birayê Sedîq, te kengî û ji ber kîjan sedeman xwast biçî vê geryana di nava Êzdiyên Ermenistanê de bikî?

■ Bi rastî di wî wextê zarokatiya min da, li gundê me Şimzê yê ku di nav herêma bajarê Batmanê de ye, tu elektrîk, televîzyon û telefon tûnebûn. Me hingê dikarîbû, di nav çend malên me de tenê dengê radiyo ya Êrîvanê guhdarîbikin. Têbîra min, gava ku wextê weşana radiyo ya dengê Êrîvanê dihat, rahmetiyê bavê min Xalitê Seyrê û tevaya gundiyan dev ji karê û barên xwe berdidan û li radiyo guhdarî dikirin. Rojekê hinga ku bêjer(spîker)a radiyo ya dengê Êrîvanê got, me hinek Qewl-Beytên Êzdiyan çapkirine, rahmetiyê bavê min pê gelekî dilxweşbû û ewî dengî di mejuyê min de jî ciyekî xwe yê taybet çêkirbû.

▼ Dema ez di sala 1984 de çume bajarê Qersê xizmeta leşkeriyê bikim, êdî ez hîn zêdetir nêzikî radiyo ya dengê Êrîvanê bûm. Lê şensê xirab, ji ber ku hingê bajarê Êrîvanê di nav hevkarîya „Peymana Varşova(14.05.1955 – 01.07.1991)“ û Qers jî di nav hevkarîya „Peymana NATO(04.04.1949-)“ yê de bû, min dîsa nikarîbû biçûma Êrîvanê. Gava min ew gundên Êzdiyan yên ku li derdora çiyayê Axrî, Sarikamiş, Îxdir û hwd. xweş xwanê dikirin, didîtin, dilê min gelekî dişewitû. Min ji xwe ra digot, gelo rojekê bê ku ez bikaribim herim wan gundên Êzdiyan û radiyo ya dengê Êrîvanê bivînim?

■ Şikir ji Xwedê ra, îsal ew xewna min bû rast û ez ji 15.07 heta 30.07.13 çûme nav avayîya ku radiyo ya Êrîvanê tê de bû û min gelek ji wan gundên Êzdiyan jî bi çavên xwev dîtî.

▼ Birayê Sedîq, te di nav vê serdana xwe de, rewşa jiyana kîjan Êlên Êzdiyan ya rojane, li nav kîjan bajêr, gund û zozan de û çawa dît anjî te çî hûner, berhemên mîrxas û rewşên bîrên Kurdên Êzdî, yên ku berî û piştî dema Yekîtiya Sovyeta berê li Ermenistanê de jiyane dîtî?

■ Ez li gundê Mamereşanê mêvanê Tosinê apê Qereman, yê ku nebiyê Cangîr axa bûm. Ez bi xêra Tosinê bira û gelek pismamên wî, çuma nava wan gundên Êzdiyan, yên ku min di sala 1984 de ji dîr ve didîtin, geriyam û min gelek gund û zozanên Êzdiyan din jî dîtî. Lê mixabin, wê gava ku ez li nava van cîh-warên Êzdiyan digeriyam û min dît ku ji %70 rûniştvan (gundiyan) gundên Êzdiyan dev ji cîh, mal-mulk û keda xwe ya bi dehên salan berdane û çûne nav dewletên Soviyeta berê anjî hatine Ewropa yê. Min ji xwe ra digot, qey ew salên 1820 heta 1914 yên ku bav-kalên wan di bin zilma Osmaniyan de gelek fermanidîtin û xwîn rijandine cardinê paşûpêr ve tîn.

Ez bi vê rewşa wan kolan û gundên valebûbûn gelekî êşiyam. Min wekî din li tu deveran şop/nîşanên eşîrên Êzdiyan nedîtin. Lê, wexta ez li Ermenistanê çûme wî cîyê şerê ku di navbêna Ermenî û leşkerên Alayên Hemidiyên de çêbûbû. Min dît ku Ermeniyên li himberî çiyayê Sarikamişê de Mûzexane yeke gelekî balkêş çêkirine. Min di nav û derveyî vê Mûzexaneyê

de peyker, nav û dengê mîrxasên Êzdiyan, yê mîna Usiv Beg û Zor Cîhangîr Axa dîtî. Ez li paytexta Ermenistanê çûme nava akademiyeke ku serleşkerên Ermenî lê perwerde dibin û min di nav vî avayiyê de jî peykerekî Cîhangîr Axa yê Êzdiyan dît û bûme şade ku Ermeniyên di wir de jî gelek rûmeteke bilind didane Cîhangîr Axa yê serwerê Êzdiyan. Gelek kesan bahsa hûnera rewşên bîrên mîna Qanatê Kurdo, Erebe Şemo, Heciyê Cindî û Şakirê Xudo yê ku min ew gelek caran wî bi saxîti dîtîbû, dikirin.

▼ Birayê Sedîq, te li Ermenistanê rasû kîjan dûrûtiya dewlatê, ya ku hinek Êzdî mîna Kurd, hinek jî tenê weke Êzdî û bi resmî ji hevûdinê cûdekirine hatî û îro li Ermenistanê kîjan ragehandinên çapemeniyê hene anjî tene weşandin?

■ Ez li Êrîvanê çûme nava avayiyekî û min dît ku, hemû ragehandinên çapemeniya Kurdî, yên weke radiyo yê Êrîvanê ya beşa Kurdî, radiyo yê Dengê Êzdîkî, rojnama RYA TEZE û rojnama Dengê Zelal tev li virê û li hemberî hevûdinê weşanên xwe dikin. Min fahmkir ku dewleta Ermenî, birastî jî dixwaze bivî hawayî bêtifaqiyê bixe nava Êzdiyan.

Li goriya dîtina min, bisilmanên Kurd jî di vê bêtifaqiyê Êzdiyan de ne bê guhne ne. Ne şixwe ewan jî bi hemda xwe gelek Êzdî xapandine û Êzdî çavreşî Kurdîtiyê kirine. Bisilmanan olperestiya xwe wisa mezin kirine ku merivê Êzdî bi hemda xwe bibêje, ez ne Kurdim.

Min pêşîn apê Kerem û birayê Tital, yên ku berpirsyarê radiyo yê Êrîvanê yê beşa Kurdî bûn dîtî û bi kekê Titalê Kerem ra li ser rewşa RYA TEZE hevpeyvînek çêkir(Spas ji bo te birayê Kemal Tolan, ku te ev gotûbêja me nivîsand û ev di gelek malperên Kurdî de hete weşandin).

Ez dûre çûme nav beşa radiyo ya Dengê Êzdiyan, min û şêx Hesênê Şêx Mahmut li wirê hevûdinê naskir. Di pey ra min hevpeyvînek bi şêx Hesênê Şêx Mahmud ra çêkir(27.07.13, ev hîna ne hatiye weşandin!) û ewî jî ez vexwandime nav stûdiyoya radiyo ya Dengê Êzdiyan û bi min ra gotebêjek ji bona radiyo guhdarên xwe amdekir(gava ev gotebêja ji min re bê, ezê hewilbidim ku wê jî bi weşînim). Bi rastî hinga ku şêx Hesênê Şêx Mahmud , 9 pirtûkên nasîna baweriya Êzdîtiyê, yên ku ewî û hevalên xwe ji bona perwerdeya zarokên Êzdiyan , yên ku diçine dibistana seretayî û heta pola 9 ji min ra kirine diyarî, ez gelekî dilxweşbûm. Dema min li naveroka van pirtûkên nasîna ola Êzdîtiyê rihent û dît, ewan jî kedêke mezin dane amadekirina van pirtûkan, her weha bê cûdatî û gelek rûmet jî dane wan kesên ku ji bo Êzdîtiyê xizmetkirine. Mînak: Di nav pirtûkên wan de wêne û nivîsên hêja Pir Xidir, Kemal Tolan, Eskerê Boyîk û hwd. hene.

▼ Ez di 25.07.2013 de çûme Gurcîstanê û ez li bajarê Tîblîsê di nav avaya stûdiyoya Radiyo ya Kurdî ya Gurcîstanê de bûme mêvanê xûşka xwe Bela. Xanim Bela, nebiyeke wan kesên ku ji ber zilma Bisilmanên kevneperest û desthilatdariya Osmaniyan, di zivîstaneke gelekî dijwar

de dev ji warên bavkalên xwe, yê bi hezarên salan berdabûn û ji bo ku ew ola xwe biparêzin, di zivistanekê de li ava çemê Arasê ya cimîdî dabûn û çûbûn xwe avîtibûne ber bextê Xaçparêstan û bêjera „Radiyo ya kurdî ya Gurcîstanê“ ye. Xuşka Bela weke ku pêşiyên me gotine „şêr şêre, çi jin e û çi mêre“, ew jî li ber dilê mîna şêrekê ye! Lewma jî min ji xuşka Bela xwast ku, ew bixwe ji me ra bibêje, ka xuşka Bêla kiyê û ew çi karî dike?

■ Xuşka Bela got: - “Ez jî di destpêkê de dêjim, gelek spas ji bo van peyvên te yê pir girîng û tû li ser çavên min ra hatî!

Belê, her çiqas heval û hogirên min dêjine min Bela jî, lê navê min yê esil, Bihara Stûrkî ye û Stûrkî jî navê bereka min e. Ez li bajarê Tîblîsê û ji dêbavê xwe yê Êzdî ra çêbûme.

Piştî ku min dibistanên xwe bi zimanê rûsî xilazkir pê ve, êdî min bi saya emekê rêzdar Keremê Anqosî dest bi xebata werger, rojnamevanî û radoya ya kurdî kir. Dûre bûme berpirsîyar û bêjera radiyo ya kurdî ya li Gurcîstanê. Wekî ku gelek kes jî dizanin, radiyo ya kurdî ya li Gurcîstanê di 29. Îlonê ya sala 1978 an de hatiye vekirin û ew jî ber tûnebûna finansan dû sê caran jî hatiye girtin. Me radiyo ya kurdî ya li Gurcîstanê, cara dawiyê di 30 kanûna sala 2007 de bi navê wekîlekî me yê bi navê Ronkayî, radiyo ya Ronkayî li Gurcîstanê dest bi weşanêkir û emê di 29. Îlona vê sala 2013 de, 35 saliya vekirina radiyoya xwe pîroz bikin....”

▼ **Min dîsa ji Xuşka Bihara Stûrkî ra got, min li Rewanê bi xemgînî dît ku, endamên civaka me li wirê bûne dû perçe. Aliyek ji mîletê me buye Êzdî-Êzdîkî û aliyek jî dibêje em Kurd û Êzîdîne. Gelo ev dîbendîtî di nav civaka Êzîdîyan me yê li Gurcîstanê de dijîn de jî peydabuye an na?**

■ Xuşka Bihara Stûrkî jî got, “belê kek Sedîq mixabin, di van dû-sê salên dawî de, hinek kes li ser vê mêjara ku te bahskir, dengdikin û gotinên wisa li virê jî destpêkirine. Lê bawerbikin, ev çend kesin ku dixwazin vê cûdebûnê bixine nava me endamên civaka Êzîdîyan li Gurcîstanê nezanin, bi dîroka xwe nizanin û tenê ji bo berjiwendiyên kesayetiya xwe vê pîrgirêkê pêşde dixînin. Şikir niha ev dîbendîtî di nav me Êzîdîyan li Gurcîstanê de dijîn tûne.

Bi dîtina min, raste dîne me Êzîdîye û ez biqurbana dîne xwe bim, lê em dîsa jî nikarên xwe ji 40 milyon hemwelatî û welatê xwe Kurdistanê veqetînin. Ev dî tîrîtî şaşiyê gelekî mezine. Ez hercar dêjim, ez yekemîn Kurd im û paşê jî Êzdî me. Divê em di nav destên dîjminên xwe de nebîne lîstik û bi zanibên ku dîjmên me bi hemda xwe vê dîbendîtîyê dixîne nava mîletê me..... “ Ev sohbeta min, ya bi xuşka Bihar ra gelekî dirêj domdike....

Min dûre jî li bajarê Tîblîsê rêzdar Îskoyê Dasinî naskir...

▼ **Birayê Sedîq li gorî dîtina te, sedemên ku rewşenbîr, nivîskar, sazî û rêxistinên Kurdên li nav Ermenistan û Gurcîstanê hene û nikarin ji aboriya radio-rojnamên xwe ra alîkarî bikin çine?**

■ Ev pîrsa gelekî girîngê û min jî pîrseke weha ji birayê Tîtalê Kerem kiribû, ewî weha bersiv da “wextê Mîr Tahsîn di sala 2012 de hate vir, min ji yekî diduyan dewlemendên ji Moskovayê, Rusya yê ra got, ewan jî gotin, erê emê li ser vê pîrsê bisekinin, lê tiştê jî nekirin. Êdî ez jî ketime dereceyê wisa na, wextê ku ez sava rojname alîkariyê ji yekî dixwazim, ji wî kesî werî ku ez ji bo aboriya xwe alîkariyê jê dixawzim. Ez jî êdî şermdikim....

”Kek Kemal, bi rastî her çiqas tê gotin ku “ Êzîdîyan li Ermenistanê ji bo pêşveçûna çand, ziman û edebiyata Kurdî kar û xebatên hêja kirine.” jî, min li wirê tu hevgerîna rewşenbîr, nivîskarên Kurd û bi taybetî jî piştgiriya ku bi radyo ya Dengê Kurdî a li Êrîvanê û rojname ya RYA TEZE ra tê kirin ne dît. Ez bi xwe gelekî xemgînî û bawernakim êdî hevgerîna rewşenbîr, nivîskarên Kurd û bi taybetî jî piştgiriya bi radyo ya Dengê Kurdî a li Êrîvanê û rojname ya RYA TEZE careke din xurtbive.

▼ **Birayê Sedîq, tû dizanî çima piraniya endamên civak Êzîdîyan di van salên dawî de, neçarbûne warên xwe yê li Ermenistanê jî bihêlin û ew bi ber welatên Ewropî û Rusya yê ve hatine?**

■ Ez bawerim sedemên koçberiya Êzîdîyan li Ermenistanê ya herî mezin, rewşa aboriya wan e. Ji xwe min berî niha got, wexta ez li cîh-warên Êzîdîyan digeriyam, min dît ku ji %70 rûniştvan(gundiyên) gundên Êzîdîyan dev ji cîh, mal-mulk û keda xwe ya bi dehên salan berdane û çûne nav dewletên Soviyeta berê anjî hatine Ewropa yê.

▼ **Birayê Sedîq tû bawerdikî, ew Êzîdîyan ku piraniya bav-kalên wan di destpêka sala 1830 de, ji Bakurê Kurdistanê (Serhedê,) û ji ber zilma dewleta Osmanîyan û kevneperestên Kurdên Bisilman reviyane nav desthilatdariya Ermenistanê, bikaribin cardinê vegerine ser axa bav-kalên xwe?**

■ Ezê bersiva vê pîrsa te bi gotinên Tosinê apê Qereman, yê ku nebiyê Zor Cîhangîr Axa ye û gundê wan Mamereşanê li hiberî çiyayê Girîdaxê(Axrî) yê bû bidim. Tosinê apê Qereman weha digot: ”Wexta ez bi bapîrê xwe re diçûme çolê, min gelek caran didît ku bapîrê min li wiyalî çiyayê Axriyê dinêhrnt, digiriya û di ber giriyê xwe de jî digot, ax welat, ax welat. Min carekê gotê, bavo ha ev devera ku em niha lê dijîn wiyalî çiyayê Axrî yê û wiyalê dinê jî eynî çiyayê Axrî yê ye . Wekî ku te hewqasî hiz ji wiyalî fikir, tû çima hatî wiyalî?

Bapîrê min got, lawo wekî em ne hatina wiyalî, wê Osmanîyan û siwariyên Alayîya Hemîdîyan me jî bikuştina, jin û malê me ji xwe ra bibirina.

Mixabin gava bapîrê min kiras guhast(mir) jî, me nikaribû bedena wî bivin di wî ciyê evîn û hesreta wî de binaxbikin.“

Vêca di van gotinan de jî xwanê dibe ku, ew Êzîdîyan ku piraniya bav-kalên wan di destpêka sala 1830 de, ji Bakurê Kurdistanê (Serhedê,) û ji ber zilma dewleta Osmanîyan û kevneperestên Kurdên Bisilman reviyane hew dikarin careke dinê vegerine ser axa bav-kalên xwe. Ê ez ditirsim ev qisûmeta wê were serê gelek ji van me Êzîdîyan li Ewropayê dijîn jî! Hêvîdarim ku Xwedê gelek sebrê bide wan Êzîdîyan li Ermenistan û Gurcîstanê mane!

▼ **Sedîq birayê hêja, ez dîsa dêjim gelek spas ku, te gelek wextê xwe ji bo bersivkirina van pîrsan veqetand û te dilê xwe ji min ra vekir. Vêca di dawiyê de daxwaziyeke te, ya ku min ne anî ser ziman heye?**

■ Belê, ez dixwazim di dawiyê de cardinê birayê Tosin û tevaya kesên malbata wî, rêzdar Îskoyê Dasinî, xuşka Bihara Stûrkî, kekê Tîtalê Kerem û Şêx Hesenê kurê şêx Mahmûdê ji bo mêvanperweriya wan gelekî spas bikim. Her weha ji Xwedê û Tawîsî Melek lavan dikim ku, tû birayê Kemal jî di saxî û armancên xwe de her serkeftî bî!

Kemal Tolan-

Berhevkar û Xemxwarê Kevneşopên Êzîdîyatîyê

Dumahiya:

Kesayetiya kurdî Lêkolînên civaknasî

Ibin El-Esîr, û Subuh El-Eşa, 4/411 ya El-Eşa.

(12) Şerefxanê Bedlîsî: Jêdera berê, rû 60-61.

(13) El-Alosî: Roh El-Meanî/Giyana wateyan, 26/103.

(14) Mînoriskî: Jêdera berê, rû 68.

(15) Nîkîtîn: Jêdera berê, rû 259.

(16) Nîkîtîn: Jêdera berê, rû 26.

(17) Jonathan Randall: Mîletê preçe/ Ummetun fî şîqaq, rû 51.

(18) El-Bundorî: Sena El-Berq El-Şamî/ ronîya birûska Şamê: rû 24.

(19) Ibin El-Esîr: Dîroka ronahî/ El-Tarîx El-Bahêr, rû 120.

(20) Ibin El-Esîr: Jêder û rûpela berê.

(21) Ebo Şame: Çavên du gulistanan/Uyon El-Rewdeteyn, 1/336.

(22) El-Cahêz: Nameyên (Resaêl) El-çahêz, 1/76.

(23) Ibin El-Esîr: Dîroka tewam/ El-Kamêl fî El-Tarîx, 1/529, 535. Ebo Şame: Jêdera berê, 2/81, 82.

(24) Usame Bin Munqêwz: Pirtûka (Kîtab) El-Îtîbar: 1/17.

(25) Usame Bin Munqêz: Jêdera berê, 1/31.

(26) El-Hemezanî: Komkerê dîrokan / Camêi El-Tewarîx, 1/298-299.

(27) Ibin Ereşşah: Ecayêb El-Meqdor fî newayên Teymûr: rû 36.

(28) Arşak Safrastîyan: Kurd û Kurdistan: rû 131, 178, 185.

(29) Mînoriskî: Jêdera berê, rû 67.

Can kurd



NIZAR QEBBANI (Sûrî ye)
Di riswakirina Seddam Huseyn da
Şergeha U'robotê
Ke nok-girînok bû şergeha kendavê



Ne şûr li ser şûran şikestin

Ne jî mêr bi hev çûn

û ne jî me Aşûr Banîbal carekê dît

Lê hemî ewê ji ber maye

Bo antîkxaneyê dûrokê bû

Ehram in ji solan!!

Kîyê me ji rewşa dulayî rizgar bike ?

Kîyê bi me bide bawer kirin, ku em ne reviyane?

û em her şevê

li ser êlegên televîsyonê

leşkerêkî birçî û tazî dibînin...

Ji xendekên neyartiyê (sandewîşekê) pêda dike

û xwe diçemîne..ku biramûse pêyan!!

Ne cenga me ceng e û ne jî aştiya me aşti ye

Hemî tiştê, ku di jîna me re derbas di be

Tenê film in

Markirina me bi lez û bez e

û hezkirina me bi lez û bez e

Weku hezkirina di destpêka filman de

û mirina me jî biryarkirî ye

Weku mirina di taliya filman de!!

Em rojekê bi serneketin, li ser mêşekê

Lê ev e bazarvaniya gumanan

Çiku Xalid û Tariq û Hemze

û U'qbe Ibin Nafê

û Zubêr û Qee'qaa' û Simsam (1)

Giş di qutîkên filman de..

bi ser hev de hatine guvaştin

Şikestinek.. li pey şikestinekê

Emê çito cengê qezenc bikin

Eger ewên lîstine

Wêne girtine..û derxistine

Fêrbûn şervaniyê di wezarêta bangeşîniyê da!!

Di her bîst salan da

Qeralekî bi fermana xwe (2) tê ji me re

ku ezmên di şîşeyekî da zindan dike

û royê di be sêdara darvekirinê!

Di her bîst salan da

Nercisîyekî aşiq xwe bûye tê ji me re

ku bêje, ew Mehdî ye.. û rizgarkir e

û paqij..û Xwedatirs e..û hêzdar e

û tenha ye..û herheyî ye

ku li ser welêt û evdalan.. û kelepûrê

Li ser Saman û çeman

Dar û darberan

Mêr û jinan

û pêlan û zireyê (3)

Li ber maseya qumarê dilîze..

Bo me her bîst salan mêrekî tevlihev tê

ku di berîkên xwe da tiliyên lexeman hilgirtine...

Tirsa me ne nû ye

Ji ber ku tirs her dostê me bû

Ji roja ku em pehlik (4) bûn

Di hindirê dangan da (5)

Ma sazman di bingehê da kuştîwar e ?

An jî em di ber çêkirina sazmanê da berpirsin?

Eger nivîskar carekê pêxweş bû, ku bibe..mirîşk

Li gel dîkan bijî

An hêkan bike an jî rakeve

Tu li ser nivîsandinê silavê bixwîne!! (6)

Bo wêjevanan li ba me sendîkatek fermî heye

Ew di dîmenê xwe da

Wek sendîkata miyan e!!

Paşê padişah in, ku jinêd xwe xwarine

di kevnerojan da

Lê belê padişah di welatên me da

hîn bûne pênuşan bixun..

Ibin Xeldon ê em dînasin mir (7)

û dûroka di hinavên me da

Nîşanek pirsînê ye!!

Ewan xurmedaran li welatên me dibirrin,

ku li ciyê wan
bo serok axa daristanekê ji pûtan biçînin!!
Pêdakar (Xwedê) ji evdalên xwe ne xwast,
ku ji wî re
Milyonek hîman ji mermerê çêbikin!!
Xencerên Erebtîyê di goştê me da
li hev û din çat hatin..
û Islam bi Islamê re ket pevçûnê

Piştî hinde hefteyan ji melevaniyê
di lêbarkên peyvînê da
di ferhenga me ya cengînê da

Ji çerm û hestiyên pê ve

Tiştêk nema

Firoka Fantom
Xwe berdide ser seriyên me
Kuştegeha me di zimanê me da ye
Pa çendîn me bihayê lêdana peyvînê giran da

Rêber paş serketina xwe
ket maxa hemamê
û em jî ketin veşartgeha sêwîyan!!

Em belaş (8) dimirin wek mêşan li Afrîqa
Em dimirin wek mêşan
û mirin bi kenîn derbas ba me dibe
û deriyên digire
Em bi tevayî di nav ciyê xwe da dimirin
û berpîrsê saringa miriyên napejirîne,
ku egeran rave bike

Em dimirin..di cenga lavlavan da
û di cenga radiyoyan da
û di cenga wekaniyan (9) da
û di cenga jibervaniyan (10) da
û di fêlbaziya seravê da

Em dimirin..serşikestî..qorîkirî (11)
Nifirkirî..ji bîrkirî wek segan
û rêberê sadîst di veşartgeha xwe da
herifandinê difelsifîne!!

Di her bîst salan da
Bo me mîhyarek tê
Royê di rastê xwe da hildigire
û rojê di çepê xwe da
û behîştan di pêjîniya me da dinexşîne
û baranê dibarîne

û ji nişka ve..Leşkerê Romê quretiya me dagir dibe
û surh dikevin!!

Di her bîst salan da
Imro-Ulqeys (12) li ser hespê xwe tê
Li padişahê ji tozê digere
Dengên me dengbirrî ne..lêvên me dengbirrî ne
Gelên me tenê efsane ne

Tenha şêtbûn

Li eywana me biryarê çêdike

Em di xwendina dûrokê da derewê dikin
Em di xwendina nûçeyan da derewê dikin
û em reva mezin diguhêrin

dikin serkeftin!!

Ey niştê min î di xwîna xwe da binve bûye
Ey yê di serbilindiya xwe da hatiye lêdan
Bajar bi bajar
Pencere bi pencere
Ewir bi ewir
Qumrî bi qumrî

-
- (1) - Evana qehremanên Ereban in di dûrokê da
 - (2) - Mebest qeralên wek Alhakim Bî Emrîhî
 - (3) - Derya
 - (4) - Çilpîkek
 - (5) - Reh`mê dayikan
 - (6) - Xatir jê bixwaze
 - (7) - Ibin Xeldon: yek ji mezintirîn zanayê civaknas e di dûroka şaristaniyê da
 - (8) - Bê biha
 - (9) - Teşabîh (mebest di cenga zimên da, ku Ereb pir ji gotinê hezdikin)
 - (10) - Kinayat (mebest dîsa pîrpeyvîndina Ereban e)
 - (11) - Nebedkirî
 - (12) - Yek ji namdartirîn hozanvanên Ereban e berî hatina Islamê.

Xwenasdana serbirrekî ereb

(Helbest: Nîzar Qebbanî)

[Ev helbest diyarî ye bo nivîskarekî, ku serî li zordariyê hildaye

- 1 -

Xelkino:

Ezî li ser we bûme deselatdar (sultan)
De bişkînin pûtên xwe paş rêwendiyê
û perestîya min bikin
Ez her demekê diyar nabim
De rûnin li ser kevîka tewatê, da hûn min berçav bikin
Zarokên xwe bê nan bihêlin

û jinêd xwe bê mêt bihêlin

û bi pey min kevin...

Berxwedariya Xwedê bo dayîna wî bikin,

ku ez şandime bo ku ez mêjoyê binivîsim

û mêjo bê min naye nivisandin

Ez im Yûsif di bedewiyê da

û Afirendar çi porekî zêrîn wek porê min pêda ne kiriye

û ne jî eniyek pêxemberê wek eniya min

û çavên min daristanek ji darên zeytûn û behîvê ne

De her ni mêj bikin, da Xwedê çavêd min biparize..

Xelkino:

Ez Mecnûnê Leyla (1) me

De jinêd xwe ji min re bişînin, da ji min avis bibin

û mêtêd xwe bo min bişînin, da berxwedariya min bikin

Rûmet e, ku hûn geni mêt govdeyê min bixun

Rûmet e, ku hûn behîv û hejîrêd min jêbikin

Rûmet e, ku hûn xwe wek min bikin

Çiku ez bûyerek im, ku ji hezaran sedsalan ve çênebûye...

-2-

Xelkino :

Ezim yê yekemîn û dadmendtirîn

û bedewtirîn ji nav hemî qeralan

û ezim heyva tariyê û sipîka Yasemînê

û ez pêdakirê sêdara yekemîn im

û ezim baştirînê şandiyar « Xeyrilmurselîn »

Hercarê min ramand, ku ez dest ji deselatîyê berdim

Xwenavê min nadike..

Ma Kî yê piştî deselatdariya van qencan bike ?

Kî yê piştî min, yê kût, yê çeperê û yê kore sax bike ?

û Kî yê hestiyên miriyan vejîne ?

Ma Kî yê ji kurkê xwe rohnîya heyvê biderxîne ?

Kî yê wan bide ber nod qamçeyan ?

û Kî yê wan li ser daran bixaçîne ?

Kî yê wan zor bike, ku bijîn wek çêlan ?

û bi mirin wek çêlan ?...

Hergav min ramand, ku ez wan bihêlim

Hêstirên min weku ji ewirekî dibarin

û min tewekkulê li ser ne Xwedê kir (2)

û min biryar da, ku ez li ser gel (netew) suwar bibim

Ji niha ve.. Ta bi roja Rabûnê.

-3-

Xelkino:

Hûn dêrînê (mulkê) min in

Weku ez hespên xwe...û koleyên xwe didêrînim

û ez di ser we re diborim,

weku ez di ser xaliyên eywana xwe re diborim

De ji min ra secdê bikin, di rabûna min da

û ji min ra secdê bikin, di rûniştina min da

Ne min hûn rojekê dîtin

Di nav kaxedên bavpîrên xwe da ?

Hajê xwe bikin, ku hûn pirtûkekê bixwênin

Çiku ez di ber we da dixwênim

Hajê xwe bikin, ku hûn nameyekê binivîsim,

Çiku ez di ber we da dinivîsim

Hajê xwe bikin, ku hûn Feyrozê (3) bi dizîka dibihîsin

Çiku ez bi nêtên we zanyarim

Hajê xwe bikin, ku hûn bê destûra min di gorê Kevin

Çiku eve li ba me gunahê mezîne

û bêdeng bin, heger ez bi we ra peyivîm

Çiku peyivîna min Quranek comerde...

-4-

Xelkino:

Ez Mehdî yê we me, min çavbikin (4)

û xûna min di dilê mêwan da lêdi de

De min vexun...

Hemî lawjanên, ku zarok di hezkirina niştiman da dixwênin, rawestînin

Çiku ez î bûme niştiman

Ezim ê tenha û herheyê, di nav hemî afirendiyar da

û ez im ê hembarkirê di bîrana sêv û bilûrê da

û di stranên şîna da

Wêneyên min di meydana da hildin

û min bi ewirên peyvan bipeçinin

û ji min ra biçûktirîn jin bixwazin

Çiku ezê pîr nebim

Govdeyê min ne pîr e

û bendexaneyên min pîr nabin

û acetê zor dariyê di şahniştina min da pîr nabe

Xelkino:

Ezim Heccac (5),

heger ez rûpêçeka xwe deynim, hûnê min binasin

..û ezim Cengîzcan.

Ez hatime we bi sungiyên xwe..û bi segên xwe

.. û bi bendexanyên xwe

Bi zorbaziya min ..

xelkino.. dilteng nebin

Ez dikujim, da hûn min ne kujin

û ez bi dar ve dikim, da hûn min ne bi dar ve nekin

û ez we çaldikim, di wa gora tevayî da,

da hûn min çal nekin.

..... DumahîHeye



Bêwar *BARI TEYFURI*



Bûm dujminê nezana

EZ VÊ HELBESTÊ REWAYÎ KURDÊN BÊ ŞEREF Û
XAÎN DIKIM ÊN KA RF.

Jêyanêda bûm dujmin ê nezana,
Rezîl dikim bi helbestan xaîna,
Ji vî gelî gelek dîkin gazîna,
Zelal dikim îşê millet bi êş, jan
Hemberî hev her yek bûye cerdevan
Li Bêloyê cîvaka kurd rûreşe,
Pîsîyê ra, xerabyêra serkêşe,
Îtbara wî qe nemaye bextreşe,
Him bê fehme, hi m xaîne, hi m nezan,
Hemberî hev her yek bûye cerdevan,
Dîroka kurd ku em bikin temaşe,
Hezar salan ku em bikin nîqaşe,
Ber dîrokê pir nezane tim şaşe,
Înadkare, kevneşope, nameşe,
Bi îxanet ser neketin serhildan,
Hemberî hev lewra bûne cerdevan
Cîvakêda tayfebaze bê nexşe,
Dem tê diçe şîyar nabe bê hişe,
Hezar sale bê tifaqe barkaşe,
Hev nagirin hevra nabin piştovan,
Hemberî hev temam bûne cerdevan
Pêşberî hev sîngêx dixin dibên ez,
Derbêd giran li hev dixin qest-qerez,
Bi xedarî pêpez dîkin hev bi lez,
Xwefiroşin, gelfiroşin bê pîvan,
Hemberî hev temam bûne cerdevan
Dijî hevdu bûne mêrxas, pelewana,
Heya dawî li hev dixin bê wîcdan,
Lê bindestin jîyana wan pir erzan,
Piştî hevda her yek bûye çîrokvan,
Hemberî hev temam bûne cerdevan
Hebûna hev berbad dîkin tûl- tevez,
Dîwanê ra, polîsan ra bûne rez,
Mal-mulkê xwe pêşkêş dîkin ça çerez,
Piştî hevda her yek bûye nêçîrvan,
Hemberî hev temam bûne cerdevan
Bi dilşadî hev difrîşin polîsa,
Nav yê hana jîna serbest ne hêsa,
Vê her êmê milletê kurd bû rusa,

Piştî hevda her yek bûye beleban,
Hemberî hev bê şik bûne cerdevan.
Beravdîbin ku erdekî di bîn ez,
Yek û yekî qebûl nake pir dexes,
Ber xelqê jî ser berjêrin çawa bez,
Cîvakeke pir xedare pir xaîn,
Bindestada, bin hukmada weha jîn
Hê nîzanin çîye xwendin, di bîstan,
Him bê fehmin, him bedkarin, him nezan,
Koletîyêda domandine tim jîyan,
Piştî hevda hevra bûne nêçîrvan,
Hemberî hev temam bûne cerdevan
Li nav gelan, li welatan bûne bez,
Radiwestin pêş şarazê mafperez,
Bin pîyê hev vedikolin bi qerez,
Yek-yekîra tu dem nabe piştovan,
Hemberî hev temam bûne cerdevan
Sextekarî xwera kirin kar pêşe,
Heya kengê kesê kurd xwe bifroşe,
Ji rewşa kurd welleh dilê min dêşe,
Bêwar Barî bi helbestan derdkêşe,
Hemberî hev temam bûne cerdevan,
Vî halide napejrîne wan cîhan

Xweda usa sere meda lêdaye,
Hemû derfet pêşberî me dadaye,
Hiş û mejû sere gelda nemaye,
Malbet-malbet, tayfe-tayfe cudaye,
Li jorêda ev ji mera cezaye,
Yek-yekîra tu dem nabû piştovan,
Hemberî hev temam bûne cerdevan
Orta wanda kê m nebûye neyartî,
Li hev xistin bi sed salan xemsartî,
Qismetê wan bûye diltî, revoktî,
Cîhanêda hertim bûne perîşan,
Hemberî hev lewra bûne cerdevan
Welat-welat kurd meşyaye belaye,
Ji yekbûnê bi sed salan dîr maye,
Yek û yekî qebûl nake belaye,
Hemberî hev derd û eşe xetaye,
Piştî hevda her yek bûye nêçîrvan,
Derbêd giran li hev dixin bi dil can.
Îxanetê alt kirîye gelê kurd,
Bê fehmîyê zebt kirîye gelê kurd

Tayfetîyê nizm xistîye gelê kurd,
 Çênebûye qe tifaqa gelê kurd,
 Yek-yekîra tu dem nabe piştovan,
 Vê rewşêda îdî nabe qe jîyan,
 Ne xwendîne, kevneşopin bi deman
 Vaîskarî li hev dixin bi salan,
 Didomînin jîyaneke pir xizan,
 Kuda diçin di bin şivan û gavan,
 Li herderê dihesbînin xwe mêvan,
 Vî halide welleh nabe ha jîyan,
 Heya kengê kurdê bi bin cer devan,
 Vê rewşêda kurdo tune cî, meydan,
 Ji rewşa te Bêwar hertim perîşan,
 Piştî hevda her yek bûye nêçîrvan,
 Bûne kujer ê gel ê xwe cer devan...

Der-dora me zebt kirîye xedara,
 Cîhana me ketîye destê bedkara,
 Derbê giran li me dixin her cara,
 Kurd kolene, bêdestûrin her derê,
 Mêr ewe ku ji vê rewşê çê derê
 Miletê me miletekî nexaşê,
 Pir bi kîne, înadkare barkaşê,
 Cîhanêda hezar sale bê nexşê,
 Bê tifaqê, bê dîwane nameşê,
 Çend qurneye dike nalîn hûrxaşê.
 Birê delal bese bike gazina,
 Pir dijware jîne nava nezana,
 Bêwar Barî rusa dike yên hana,
 Hê nizandin çîye kurd û Kurdistan,
 Hemberî hev temam bûne cerdevan

Jîyanêda rastîyêda serkarim,
 Bi helbestan dijî bedkaran şervani m,
 Êrîş dikim ser xaîna bi biryarim,
 Yekbûnêra hero-her roj hewari m,
 Jîyanêda bûm hedefa nezana,
 Rezîl dikim bi pênuşê xaîna...

Pêş zulmê serhildani m,

Bi crsaret ez di meşim,
 Pêşerojêra hîvîdarim,
 Karê xweva altindarim.....
 2010. GUND Ê S. BÊLOÊ. KARF. .

EZ-EZ

Heya ku hebin xwefiroş,xaîn,
 Heya ku dijî hev kurd dikin jîn,
 Heya ku di dome bê fehmî û kîn,
 Emê jî bi jîn bi keder, XEMGÎN

HEYA KU EZ-EZ YEKSER NEBIN YEK,
 EM RIZGAR NABIN JI ZULMA FELEK....
 2013.

ÊN KU

Bimeşin bê mafno dijî nezanan,
 Bese hemberî hev bûn ceş cer devan.

Tev li meşêbin ya meye meydan,
 Bi navekî paqij pêwîste jîyan.

Em ku radibin di der ze bedkar,
 Derfetê nedin ku we bikin hevkar.

Nexapin gotinên barbar, oldaran,
 Rêya me azadî herin serhildan.

Heya kurd hevdura nekin muqatîyê,
 Tu kes jî ji mera nake dostanîyê.

Heya kurd hevdura nekin biratîyê,
 Nagêhjin,nabînin tu wext azadîyê.....

ÊN KU FEHM NEKIRIN HÊ ÇIYE YEKBÛN,
 WAN RE DIBE ARMANC XEYAL
 SERXWEBÛNNNNNNNNN.....

NETEWÊN TÊGÊHIŞTÎ, BI RÊK Û PÊK
 Koletîyê qebûl nakin natewin
 Îxanetê hes nakin
 Serbilindin, serbilind.....

25. IV.2013

Beyar Robarî

Serê salê..

Me heye..

Serê salê .. serê salê
 Sal bi sal tê û derê
 Jin û mêr hundir dimalê
 Dibe xemil û xêz û mirov şad dibê
 Reqs û sema ji hêvar de, ta sibê
 Li meydan û xwaringehan û malê
 Li her welat û ji ciyê roj hiltê û derê

*

Serê salê .. serê salê
 Dem nasekin tim derê
 Hîro dere û sibe dîsan tê!
 Sal derbas di bin wek gulma avê
 Kalbûn û pîrrbûn ez û xinavê
 Bîst salin dîrim, ez ji bab û dayê
 Û ji nazdra dilê xwe, Şêrîna dêm tavê

*

Serê salê!
 Jibo hinan xwarin û vexwarine
 Û jibo hinan mijûlî û raman û pirse
 Û hin kesan re, perîşanî û tirse
 Jibo hin kesan sergêjî û rojek tirşe

*

Serê salê!
 Jibo hinekan bêdera perane
 Û li hemberê wan jî, piran tune av û nane
 Û nejtî kinc û xwarina zarokane


*

Serê salê!
 Sal bi sal vedigere li malê
 Sersala kurdî destpêka nû jiyane
 Şêrîn û rengîne rûyê çiya û zozanê
 Were em tev pîrozkin, vê cejnê lê bermalê
 Hîro cîhan tev xemil û şahiyê, dilovanê
 Û roj roja keyf û şadî û seyranê

19 - 10 - 1996

Me heye

Me heye darek bî yê
 Çi xweşe lê zeriye
 Rûniştin li bin sî yê



Eyşe Şan

Me heye darek gozê
 Çi delale ew lê dilsozê
 Û xweşe rûniştin li bin, dema roj hildide pozê
 Vêdi hesê mirov, li bin ji germ û tozê

*

Me heye darek zêtûnê
 Gazî min kir xatûnê
 Dêm sor qeysiyên Erzerûmê
 Got were em rûnin, li bin va dara zêt ji rûnê

*

Me heye darek lêmûnê
 Berên wê şêrîn wek rûyê xatûnê
 Wek agir û pelên titûnê
 Dilê min şewtand, zeriya Çiyayê Lêlûnê
 02 - 12 - 2013

Eyşe Şan

Eyşe Şanê .. Eyşe Şan
 Şêrîn deng û nazik can
 Te hîştin lipê xwe, xweş kulam û stran
 Tu hatî rakirin, bişêwak ne ciwan
 Eve rewşa hûnermend kur dên û wêjevan
 Bêkesin û bêxwedî biseranserî jiyân!!

*

Eyşe Şanê .. Eyşe Şan
 Naziya dilan, lê dilovan
 Ey nazdar dengbêja me kurdan
 Xweşiya dengê te, xemil û xêza niştiman
 Mixabin li ber mirinê, Kurd li te nebûn xudan!!

*

Eyşe Şanê .. Eyşe Şan
 Te hebû xweş deng û ciwan stran
 Bixweşiya gul û gol û zozan
 Şêrîntir bûn dengê te, ji çiyayên Kurdistan
 Û germtir bû ji pêsîra dayîkan
 Nalîna te, banga bindest û şoreşvan
 Banga berxadan û serfirazî jiyân
 Te lorand hest û keserên evîndaran

Eyşe Şan: Dengbêjek Kurd binavûdenge bû û wê xizmetek mezin ji çand û hûnera kurdî re kir. Lê mixabin dem mezin bû kesek li wê xwedî derneket û gava anîjiyanbû qet kesek pênehesî. Rewşa hûnermend û wêjevan û nivîskarên Kurd gelekî xerabel! Hezer rehme li giyanê Eyşe Şanê bin û sipasîk mezin jibo ew hûnera ciwan kû ji gelê xwe pêşkeşkirî..... 09 - 02 - 1997

Tev ava hênik û sebeta hejîr û tiriyê

(1938 Amed - 1996 Izmîr)



Can kurd



Bo Encumena navbilind

Banga we ya sist,
 Di nav gelê min de naye bihîstin
 Efsaneya we ji me re pêda kirî,
 Ji zarokên me re tew naye gotin
 Pezkoviyê we ji me re anî,
 Nêrî ye, tew naye dotin
 We xwest ku hûn bazarê bikin,

Lê belê bazar li ser we hat kirin
 Hinek ji we hatin kirrîn,
 Hinek jî hatin firoştin
 Bira bira ye,
 Hema bazara Hewlêrê weha ye,
 Ciyê jar û hejara,
 Li vê zivistanê jî,
 Li ber reşba û serma ye,
 Dîsa jî ji we re û ji giş Kurda re,
 Di serê sala nû de,
 Em di bêjin:
 Serkeftin ...
 Serkeftin

Dilşad Mella



Kulên Kevnar

Di çavên te de
 Çîrokên xwînê dixwînim
 Û li şûna te
 Gulên jihara
 Didim hev
 Di bedena te de
 Sêvên ji hesin dertên
 Û di nav porê te de
 Pîrepind hêlînên xwe dirêsin
 Di himêza min de
 Kulên kevnar
 Hêlînên xwe ava dîkin
 Û efsanên gemar
 Di deryada min de
 Dimeyîne
 Di tîrêjên çavên te de
 Li azadiya xwe digerin
 Lê, bi xumava şevê
 Tu hêviyên min dişo
 Bi singa şevê
 Dilê min î zarok himbêz dîke
 Û pelê dara hêviyên min
 Bi xwînek tevitişî diweşîne
 Roj û şevên min
 Wek hev derbas di bin
 Û zarokên tirsê
 jê divejîne
 Bi çavên şikestî li te dinerim
 Û deryad min disoje
 Sewdan di be dîlê birhatinên
 kevnar
 Û keskesora jiyana me
 Bi gotinek xwe re
 Bê reng neke...

**Helbest:
 Mejid Mejid**



**Wergerandin:
 EhmedMustefa**



Berf

Dibarê wekî Pepûlka spî
 Li ser bêhna axê
 Li asiman li ba di be
 wekî ku Mest bûbe ji rûbarê
 Meya bi hûshta Xwedê

Sivik weke sîbera yarê
 Rizgar bûye ji ewrên xwe
 Natirse ji qadraqêşê
 Li ber jenîna /Orirîne/
 Semayê dîke
 Mûzika hezkirna xweda
 Xakê digire ku kîna veşartî vemrîne
 û li û li ser rûyên
 zarokan
 kên nîgar dîke
 Pîrr dibe li ser qurmên darê
 ku singa xwe bi dijwarî vedîke
 û stûr dibe li serbana mala me
 Di nêvî de dûmanê zivistanê
 Wek ku gatoyekî alîyî dihele
 Ro ji berî wê dixwe
 ku ez diyarî rojbûna yara xwe bikim

Yûsiv Berazî (Bê Buhar)



KESÊ BIN DEST

Kesê Bindest ji dijmin ew netirsê
 Li dij dijmin divê Ew dest hilînê
 Li ber dijmin serî deynê Bitirsê
 Ne mafê wî li dunya jîn bimînê
 Kesê Tirsok her roj di mîrê Li dunya
 Kesê Mêr rojekî Dimrê di jînê

Kesê Tirsok bi saxî nav mirî ew
 Kesê Mêrxas ku mir lê nav dimînê
 wekî baz wê li ser çiyayê Bilind bê
 bi azadî jiyana xweş bibînê
 Kesê Tirsok riha nabê Ji dijmin
 Ji dijmin ra mirîşk bê wê di pînê
 Ji bo hêka xwedîkê wê bi kêrê
 Serî jêkê li dunya wê nemînê
 Ji ser çiyayê av ku bê xar wê zelal bê
 Li çî kort av genî bê wê bimînê
 Li hawêr wê merovê wê nexweş bin
 Ji kelmêşan ji mîkrobê Ji bînê
 Kesê Tirsok bi wîra gel dibê Qels
 ne tirs mêran di nav gel da diçînê
 Kesê Mêrxas ne bes mêr bê bi kuştin

Kesê Mêrxas divê Ewya bixînê
 Ji zanyarî ji abûrî ji konî
 bi her siya ra ku azad bê bi xwînê
 Kesê Tirsok nebê Tacir li bazar
 Ti kar nakê Ne wê rê ew kurrînê
 Qesab ew bê dirav nadê Kebabê
 Kebabê Kes qe têr naxwê Ji bînê
 bi dil ew kes ne wek ferhad û mem bê
 Ti car nemrê Ji bo şîrîn û zînê
 Mirin teîlî merov barkê Ji dunya
 Kesê Namûs ku pir bê wî şînê
 Jiyan min bê buhara xweş bihartî
 bi zanyarî bi ramanî bi vînê
 Kesê Bê hiş ti car wê guh nedê Min
 Kesê Hişyar ji min wê sûd bibînê .

Xorşîd Şûzî



WEŞIYÊN WERZAN

Xwezî havîn karê çûnê nekiriba
 Bayê bê ol li windabûna wî digere
 Beşên wî bi birînan hembêz dike
 Wekû kortê çolan barana şînê fir dike

Li ser tilîkên surabekê digevêze
 Siha wî ser pêlekê bi girî xwe davêje
 Nalînen wî dikevin guhê bûkeke behrê
 Li ser milê stêra xweşîkbûnê pal dide
 Xewnek sivik bi çavên wî dadixîne

Di şînahiya fire de dice

Li girnejînekê digere

Ji ber lêvên evîna wî bazdaye

Li ser mile kefzîne siwar dibe
 Wî dighîne hembêza wesiyin nerme
 Di germiya şevbuêrkekê de şîn bûne
 Pêve tirîyên çêjatî nuxurî cêbûne

Xuncek sax li hêviya çîninê ye
 Li ser memikin bilind di nav ewran de
 Jêre damarên asimana diçin noqbûn bi zeluli
 Peşkin ji kaniya şîr çen dikin devê wî
 Di serê wîde digerin çirûsk û tavî
 Wî dikişînin..... Hembêz dikin
 Wekî kulîlkan xunav di mijînin
 Wî derbasî gerînek bi lotik dikin
 Têde tayikên avê û rivînê pev diçin
 Gerokek xwirt zor jê dibe
 Ji agir û ba re wî davêje
 Berbang çav û deng ji wî diqurpîne

Dixwaze hemêzên wê jêre rizgarî be
 Dilê xwe dorpêç dike di destên xwede
 Û di nav kutka de wî bê deng dike
 Bîn dike...
 Fir dike..
 Ewrin ji xwîna xwe
 Di gola êşa xwe de nalîn dike
 Xwe noq dike di kaniya şîr de
 Di kavên windabûnê de
 Efsana rês dike
 Î ro roja şûştina gunehane
 Li ser delavê deman de
 Wekû zûmin rêwî di be
 Ji derîyekê derbasî derîyekê di di be
 Di nav gerdûna de.....
 Windabun dibe

13.11.2007

Beyar Robarî

Roja yekemîn li dibistanê



Gundê me li serê çiyakî ji çiyayên Ropjavayê Kurdistanê - herêma Efrînê li navçeya Robariyan dikeve, gund hemî kurdin û wek tê bîra min wê demê mirovekî tenê bi erebî baş nizanî .

Çend kesan bi erebiyek pir xerab dendikirin, Jiber dibistan dereng li gundê me vebû û tev wê gundê yekemîn bû di Çiyayê Lêlûn de kû dibistana seretayî lê hate vekirin .

Têkeliya gund bi navendên ereban re wek Helebê tune bû, Jiber rêk tunebûn û tirimbîl nikanîn biçûna û bihatina gundê me, Ji xwe berî sala 1980'î tu kesî di gunde ne derektor û ne jî tirimbîl tunebûn .

Xelkê gundê me bazirganiya xwe bipiranî li bajarê Efrînê dikirin û bi dewerên wek ker û hespan diçûn û dihatin wir . Di dawiya salên 1950'î de hindik-hindik xelkê destpêkir û çûnûhatin bajrê Helebê . Milet ji gund bi dewerê xwe birêdîket û diçû ser rêya ya nabera Efrîn û Helebê kû jêre digotîn (keroze) û li wir tiştên datanîn û dewerê xwe li stûnê telefonê girêdidan û cihare kayê jêre datanîn û li ser kêlek rêkê radiwestîn û destên xwe ji tirimbîlan re radikirin ta otobûsek an mikrobasek jibo wan bisekniya û ew lê siwardibûn û diçûn Helebê.

Bi pîranî otobûs an mikrobases tijîbûn û divabûya xelkê gunde me û gundên dor me di wan otobûsan de lis er lingan bisekniyana ta Helbeb. û ger li ser rê nuqta kontrola polîs buhata xuyan, şûfêr ji rêwiyan dixwast kû li ser erdê danîşin. Jibûna polîs wî sizenekin, jiber qedexebû hejmarê lînîştvanan (siwaran) ji ya kursiyan bêtir be.

Şênîyê gund li bajarê Helebê kar û barê xwe diqedandin û berî hêvarî ji bajarê vedigeriyan û lis er rêya gund dadiketin û tiştên xwe dikirin xurcan û li dewerê xwe dinîştin û berê xwe didan gund. Û ji wir ta gund, rêkê dora demjimarek û bîst xulikan dirêjdikir.

1

Wê demê belkî du-sê kesan hewşên xwe li bajarê Helebê hebûn anjî bikirê runîştibûn .

Kurdên me ditirsîn biçûn Helebê jiber ziman nizanîn û ehetiya li wir nedibirin û nexwendebûn û Helebiyan henek û kêrçên xwe bi kurdan dikirin . Digotîn hûn çiyayî ne û gundî ne û paşvemayîne, û kinc û bergên me li xweşiya wan nedîçûn. Wan bi çavek xerab û çûk li me kurdan dinêrîn!!

Lê bi demê re ew helwesta bi helwestek şovînî xerabtir hat guhartin û digotîn hûn tehlûkene li ser yekîtiya Sûriyê. Û jixwe hûn biyanîne û divê hûn bi erebin û zimanê erebî fêrbibin, ger hûn dixwazin di vî welatî de bijîn û bimînin!

Em vegerin ser roj mina yekemîn li dibistana gund, wek hemû zarokan dema ez bûm şeş salî dayîk û babê min şabûn kû kûrê wan hêdî ke here dibistanê ye. çentak ji min re kirîn û sidriyek û gotin hîsal tê herî dibistanê û divê tu bixwûnî jibûna tu birovek zanabî û wekî me kor nemînî û zor zehmetiyê di jiyana xwe de nekşînî. Lê we demê min nizanî watey wan gotinan çî ye. Bes min ji dayîka xwe pirsî û got: Anê tu û babo ve nekorin, çavên we hene û hûn pêşiya xwe dibînin!

Dayika min got:

Lawê min mirovê nexwende wekî korane, jiber wê em dixwazin tu xwendina xwe başbikî da dipêşrojê de mirovek hêja ji te derê.

Di mal de ez ji hemû xak û birakên xwe mezintir bûm û hengî em bes du birakbûn û xakek min hebû mixwebin ew zû anjîyanbû û dayîka min gelekî li ser wê dagirî û xeydî. Bab û dayîka min gelek ji xwendinê hezdikirin jiber ji xwendinê bêparman û ji wan re bûye keser.

Min wek zarokên di salên min re, dibihîst kû mamoste li şagirtan dixin û bi zimanek din bi wan re daxivin! Berî em herin dibistanê em ji mamosteyan ditirsiyan û me newêrî nêzikê dibistanê bibûna!

Sala 1960' î havîn çûn û me bêder hilanî û danî kelandin û dan kuta û savar hêra û kar hêdî sivikû û hêdî-hêdî havînê ciyê xwe ji payîzê re hîşt û barkir, ew gema tîn û bihêz hêdî hêdî combû û herçû derva hênîkbû û firte-firta bê zêdedibû.

Rojek şemiyê gor têbîra min dora nivê meha cotmehê bû, sibebû piştî me taştê xwar dayîka min bidestê min girt û çente kire destê xweyî din û em berve dibistanê çûn dibistan ji mala me ve nêzikbû.

Herkî em ji dibistanê ve nêzikbûn kute-kuta dilê min zêdebû û tirs min hîn mezintir dibû, li min xuyabû kû ez ditirsim û min bi dayîka xwe re got:

Anê ez naxwazim herim dibistanê, were em herin mal.

2

Dayê: Çima kurê min?

Ez: Ez ditirsim û mamosteyan nasnakim û dibêjin ew li zarokan dixun.

Dayê: Metirse lawê min tu ne bitenêyî. Zarokên gund yê di salên te re, giştik hîro li virin û divê tu bixwûnî jibûna zane derêyî û kor nemînî.

Min got: Ez nekorim û çavên min rind dibînin.

Dayê: Ez zanim tu nekorî. Nekorî yanê bo tu zîrek û zane derêyî û di pêşerojê de aqilmendekî hêja ji te derê.

Min got: Aqilmend çî ye?

Dayê: Aqilmend ew mirovê pir tiştan dizane û zane bixwûne û binivîsîne.

Min got: Aha ! Yanê wekî kê di gund de?

Dayê: Di gundê me de aqilmend tunene.

Min got: Lê li ku hene?

Dayê: Li bajarê mezîna aqilmend hene.

Min got: Tu çûyî bajêre ticaran?. Tu çî zanî tu li wir hene?

Dayê: Belê ez çûmî û min tu li wir di zayîngehê aniyî.

Min got: Aha, û te aqilmend li wir dîtin?

Dayê: Na, min nedîtin lê min bihîst kû li wir gelek in û pir tiştan zanin.

Min got: Min milên xwe hejandin û got ez nizanim, dibe.

Dayê: Lo tu çiqas dikî pilepil û serî mirov dêşîn!!

Min got: Yanê ez devî xwe bigrim?

Dayê: Na devî xwe megire, lê pir meke pilepil.

Ha em gihîştin dibistanê, baş guhdariyê mamoste bike û tim melîze û bi zarokan re megirehev û nanî xwe mede kesî. Û balê xwe rind bi tiştî xwe de, da kes ji te nedize.

Min got: Ezê balê xwe baş bi tiştî xwe dim.

Dema gihîşt ba dibistanê, min dît pir xelk li wir kombûyî û gelek zarokên wek min li wirin û hinekan ez ji wan nas dikim .

Dayê: Tu dibînî çiqas zarok wek te hatinî û ew jî roja yekemîne derin dibistanê.

Min got: Ez dibînim û hinekan jê nasdikim.

Dayê: Başê tu û hevalên xwe hûnê bihevre herin û werin û bixwûnin. Û zarokên din jî tê hindik-hindik nasbikî û hemû ji gundê me ne .

Ger kesekî li te xisit, bi mamoste re bibêje û çaxê tu hatî mal jî, ji min û babo re bibêje. Da em bi xwediyê wî zarokî re denkin jibo şerî xwe di te nede.

Min got: Başê anê ezê wek te gotî bikim.

Dayê: Ger mîza te hat an jî tu tîbûyî bi mamoste re bibêje, jibo tu kanibî herî avê vexî û mîzkî.

Min serî hejand û got: Başê dayê.

Gava em gihîştin ber deriyê dibistanê xelk tijî bû .

3

Dayîka min silav da pir kesan û wan li halê hevdû pirsîn û zarokên xwe

bihevdu didan naskirin.

Ew jin û mêran jibo min wek zarok gelek mezin dihatin xuyan. Herwisa çavên min li zarokên dinbûn û kinc û çentetên wan, Hin zarok bikinçên pak û ciwan bûn û hin jî bi kincên gemarî û kevin bûn.

Min çend zarok naskirin, bes ewên mala wan li dor mala me û xizmên me ve. Hinek cara yekemîn bû kû ez wan dibînim û min nizanî navê wan çî yê û ji kîjan malê ne. Wê demê gund bi min pir mezin dixwaniya! Min digot bab û dayîka min çawa ew zanin li gund bigerin û herin û werin, Ez ditirsîm ji mal bi tenê dûrbiçûma, jiber min digot ezê çawa vegeim mal û ezê hindabibim.

Em ketin hewşa dibistanê kû sûrê xwe ji sênca keviran pêkdihat .

Hewş gelekî ferebû û piraniya xwe jî dûzbû, Dibistan bi va şeweyê / [/ hatibû avakirin û ew ji pênc odan pêkdihat û dîwarên xwe kelînî bûn.

Şênî li pêşiya avahiya dibistanê kombû û me sehkir mirovek ji odakê derket derva û zengilek di destê û zengil lêda û bi zimankî din, jibilî zimanê meyî kurdî denkir û ez tiştêkî jê tenegehîştim!! Lê min bala xwe dayê zarokên mezin (kevin) hemî rêz birêz sekinîn û destên xweyê rastê danî ser milê hevdu û bêdeng manî.

Min ji dayîka xwe binermî pirsî û got: Anê wî mêrkî çî got û kî ye ew?

Dayê: Bidengek nizim ew mamoste ye, lawê min. Bes çî got ez nizamim, jiber ez bi erebî nizamim û divê ez ji hinekan bipirsim.

Min got: Çawa tu nizanî?

Dayê: Lawê min ew nezanimê me ye û ez neçûmî dibistanê.

Min pirsî û got: Erebi kî ne?

Dayê: Wek çawa em kurdin miletek din jî heye nave erebin.

Min got: Ê çima mamoste ne Kurd e û divê em bi erebî bixwûnin?

Dayê: Ez çî zanim lawê min. Hukmet wisa dixwaze.

Min got: Çawa tu nizanî û tu mezin?

Dayê: Mirov nikane hemû tiştan zanibe û min nexwendî. Van pirsan ji bavî xwe bike, belkî ew ji min çêtir zanibe.

Min got: Başe ezê ji babê xwe bipirsim.

Dayîka min ji mêrikekî pirsî û got:

Hemîd tu kanî xêra xwe min re xeberdî, mamoste çî got?

Hemîd: Mamoste bixêrhatina zarokan kir û pêçek din wê navê wan bixwûne û xwast kû şagirtên nû wek yê kevin di rêzê de lipêhev bisekin û bêdeng bimîn.

4

Paşê her polek wê lipêhev derbasî pola xwe bibin, Û di hin odan de du pol rûdinin jiber ode hindikin û sê mamoste tenê dibistanê zarokan bixwendin din û bivedibin, Û wek hûn zanin hejmara zarokan mezine û pênvroj zarok werin dibistanê.

Mamoste berî gî nave zarokên kevin xwendin û min bala xwe dayê ew lipêhev di rêzan de sekinîn û destên xweyê astê dan ser milên hev û sidiyek reng bêlûnî lihemiyên bû. Wisa ta pênc pol biserî bû paşê dor hate me û mamoste navên me xwendin û min yekmîn car bû paşnavê xwe dibihîst. Ger ji min re negotana min nizanî kû ew paşnavê min e!

Dirêjnekir mamoste navê min xwend û min nexwest an tirsîm yan fedîkir ez herim di rêzêkevîm, dayîka min bi destê min girt û birim nava rêzê û bizora destê min ji destê xwe kir, Min jî destê xwe dat ser milê zarokê pêşiya min û xulikek neçû yekî jî destê xwe danî se milê minî rastê, Ji tirs û fedî, birastî min pêşiya xwe rind nedît.

Paşê mamoste hemî derketin derva û dudu wan jibûn û ne ji gundbûn. Mamoste tiştêk got me nizanî çî ibêjê, lê me dît zarokên kevin şeq jihev vekirin û kirine teperep û destên xwe ji ser milên hev danîn û dan kêleka xwe. Mamoste ji mere jî gt: Starêh, stahêd, bikurdî yanê amedebe û vehese.

Bi demê re em fêrbûn wateya wan peyvan û me ew ezberkirin.

Jiber heroj çend û çendcaran ew di rêzê de disekinîn û me dikire teperep bi pêyan. Ew toreyê ji welatên Rojhilata Ewropa biribûn û armanca hukmetê

ji vê perwerdeyê mejiyê zarokan bişo û ji çûkî de bi rejîmê ve girêde.

Hundir odê hinekî nepakbû û du qor rehil her yek li ber dîwarekî bû û du pencere di odê de bûn her yek ji di hêlekê de bû, wek tê bîa min em sê zarok di rehlekê de rûniştin û di qorê sisiyê de.

Mamoste derket çû oda mamosteyan û piştî çend xulikan vegeirî û komek pirtûk di hemêzê de ye, Ew pirtûkan danîn ser masa xwe û paşê li me yek biyek belavkirin.

Û dibere dendikir lê kesî ji me nizanî ew çî dibêje. Paşê tiştin li ser depreşê nivisandin lê me qet nizanî çî nivisandî, dipêre navê me ji kaxezekê xwendin û ji her yekî xwest rabe ser xwe û pirsin jê dipirsîn, lê em tenegehîştin ew çî dipirse an dixwaze. em hemî bêdengbûn û me nizanî bersîva wî bida û em jê bitisbûn. û di keysa yekemîn de dema berdanî derva me bawernedikir kengî dibistan we rojê ke biqedê û em herin mal û ji wî kesî xelasbin.

Serê min gelek êşî jiber me nizanî mamoste çî dibêje û tirs û yekemîn roj wisa em tîngirtin di çîkî de û nikanin rehet bilevin û rehetiya xwe bibin.

Û bi ser wê de gelek zarok di odakê de û piranî jê nasnin, jiber we hemî bihêna min tengbû û dibistan û mamoste û ew zimanê pê daxivî di çav min de reşbûn, Bendora wê li serr min meznin bû û dirêkir û ji zimanê erebî kok heznekir û wek zikreşîkê bidemêre bi min re li dijî wî çêbû.

Wisa bi min re dirêkir ta min dibistana navendî beşê yekemîn tewakir, paşê hêdî-hêdî hinekî min rehetiya xwe kanîbû bîdiya di erebî de.

Piştî ez vegeirî mal ji dibistanê wê rojê min gelekî dagirî û ji dayîka xwest ku min neşînin dibistanê, jiber ez tiştêkî ji mamoste tenegehîştim serê min êşî, Ew li ber min gerî û di ber dilê min re çû û hat û got:

Lawê min ez zanim hinekî jibo te zehmetbû hîro, jiber roja yekemîn bû û tu hîn zimên nizanî, lê bi demêre hindik-hidik tê fêrbibî û serî te nêşe. Paşê tu nebitenkêyî, te dît çiqas zarok wek te hene û hemî bizimên nizanin.

Min got: Serî wan jî dêşe.

Dayê: Raste serî we dêşe, lê dive hûn damîşbin û bihênê xwe fere bikin.

Min got: Anê bi mamoste denkin bila bi kurdî ligel me denke.

Dayê: Lawê min mamoste guhdariyê me nake. Rê tune dive aqilî bi ser xwendinêdî da kû tu zû fêrî zimên bibî û paşê alîkariyên birakî xwe bikî.

Dayê: Mamoste çî ji we re got an da we wek karê mal?

Dayê: Mamoste pir denkir lê ez tenegehîştim wî çî got. Zarokên din jî wek min tenegehîştin.

Min got: Bese pirtûkin dane me û ew di çêente dene û tîpin lis er depreşe nivisandin û me lipê wî xwendin û di lînûsa xwe de bipênûsê qurşînî nivisandin.

Dayê: Ka pirtûkên xwe derxe beve dayîkê xweke.

Min pirtûk derxistin û berve dayîka xwe kirin û wê gt: Ohhh, pirtûkin pir ciwanin, hajê hebe gemarî mekê û nedirîne, da mamoste ji te nexede.

Dayê: Xwarina te besî tekir?

Min got: Belê anê beskir.

Dayê: Kesî şerê xwe li te da?

Min got: Na, çima henek ke şerî xwe di min bidin!!!

Dayê: Carna mirov li ser tiştan digrehev û şerdike.

Min got: Ka babo lik u ye?

5

Dayê: Babê te li mala metê te ye. Pirtûkên xwe rake û wee nanî xwe bixwe û ew tiştên we li dibistanê birinî carekê dudiyên bixwûne jibûna baş di mijî te de rûnin.

Min got: Başe dayê. min çentê xwe rakir û hinekî tev birakê xwe ez listim û pê şabûm û bihevre çun nanê xwe xwarin û wî teve min pirtûk danehev û me rakirin. ew gelek şabû dema ez vegeirî mal, jiber biroj pêde bitenê bû û kes tunebû vêre bilîze. Demez vegeirî me min bezî û dest bi pirsankir û xwe did or min re çekir. Dawiya çîrokê.

Hoşeng Hesên



Saliho û sed wereqe

-keçê Şemso wa porkurê.. Şemsoooo..

-ha ha çi heye lawo qîjwîja te vê sibehê ?

-keçê qey deng nayê te ev saetek ez ban te dikim, bi zû zibala xwe derx wa terektoza zibalê hatiye û pera hazir bik ji bo tu bidê va îro serê mehê ye

-wa, ê başe serxêrê be va ezê dengê bi lîlîninm û dûra ezê zibalê derxim, lê ka pere bi min re tinene, ti kare bide min heta Misto bê ezê bidim te

-weleh bi min re tine, giş sed wereqe ye û wî jî ez bidê mê, her ba Saliho xwediyê dikanê û sed wereqî jê bistîn .

Şemso jî yek nekir dido û çu ba Saliho yê ku dihat naskirin bi pîsbûna xwe ji aliyê pera ve , lê wê çawa bike kes jê pêve tine ku pera bidê .

Zêdetirî 40 deqî Şemso mersele ji Saliho re digot, lê ew li ber ne diket û dawiyê wî dayê piştî go qirka wê zuhabû û terektoza gîha tara din wê bi bazdan xwe gihand terektozê û zibala xwe avêt û pere dan xwediyê terektozê.

Piştî go Misto (zilamê Şemso) ji karê xwe hat malê û xirtik xwarin Şemso jêre got ji bo pera bide Saliho .

Êvarî dema Misto derket çû û perê wî danê . Bi şevê Misto lawê xwe şand dikana Saliho ji bo pakêtekê bîne, dema ew veşariya ji bavê xwe re got Saliho zêdî heqê pakêtekê sed wereqe jê qut kir û got min daye ca te.

Bavê wî aciz bû, lê wî fenê Saliho nas kir û ji ber wilo wî û Şemso şer kirin û wî sûnd xwar gi Şemso pera yan tiştêkî din ji ba wî ji niv re bîne ewê wê berde.


Dawiya şevê dema Xelef(birayê Misto) hat ba wan malê, piştî ew runiştin wî got çima ti pera ji ba Saliho tîne û nadê, ana dema ez hatim wî ban min kir û got sed wereqê min li Misto ne rabû min danê ?? !! Misto nema zanî bû wê çi bêje heya bi xwînê di damarê wî de sekinî , piştî wê ew rabû bo here ba Saliho bo carek din fenê xwe lê neke dema gîha ba Saliho wî dimaçû xwe derxist û sûnd xwar wê wî bikûje lê Xelef û zaroka nehişt û rece jê kirin gi bêhna xwe fire bike, zêdetirî du sa'etan ew li ber wî digeriyan heta ew runişt û got ez nema dirim . Roja din dema Misto ji kar veşariya di ber dikana Saliho re hat lê wî li aliyê dikanê nenerî û silav nekir .

- Haaa birayê Misto qey silav li me nabe (Xalid cinarê wî got)

- Ji fediya xwe re cinar , ji bo em behsa pera jê re nekin (Saliho got) dema Misto ev deng hatê ew dîn bû û aqil di serê wî de nema û wî êrîşî Saliho kir û sê fişek di serê wî de berda û ew kuşt . Piştî wê polis hatin û Misto birin û hemû xelkê digotin (ma ji bo gi sed werqî nede rabû zilam kuşt) Misto di nava xwe de got:

- ê zane zane û ê nizane dibêje bo sed werqî ye !!!

PIRTÛKÊN NÛ



Piştî çar berhemên hêja ... Ristek Lale derket

*Tipên evîneavdar 2007 ji çapxana Bafet.

*Asoyekî tijî Endeko.. tîrmeh 2008 ji weşanên Han.

*Di nav henasên kovanan de ...avdar 2010 ji weşanên Han.

*Li ber pala welatekî birîndar diherikim... avdar 2012 ji weşanên Han.

Helbestvana kurd Mizgîn Hesko bi pêncemîn berhemê xwe (Ristek lale) tête beramberî xwêner û hezkiriyê helbesta kurdî ,lê vê carê bi helbestên xwe yê dema destpêkê û bi şeweyê kilasîk.

Di pirtûkê de 30 helbest cî digerin

Ji 58 rûpelî ew pêk tê

Tabloya bergê ya hunermendê kurdî şewekar mamoste Inayat Attar e

Ji nav weşanên Han- Berlîn derket-û hate çapkirin.

Bi hêviya ku ev helbest pirtûkxaneya helbestên kurdî dewlemend bike.

Mizgîn Hesko

Di 20.mijdarê de sala 1973 li gundê Şelhûmiyê (Qa mişlo) jidayîkbûye.

Jibe rhe mênwê yêncapkirî:

1- Tîpên evîne-Çapxana Bafet –Adar 2007

2- Asoyekî tijî Endeko —Weşanên Han –Tîrmeh 2008

3- Di nav henasên kovanan

4- Li ber palawelatekî birîndar diherikim —Weşanên Han –Adar2012

Emaila Helbestvan(mizginahesko@hotmail.com)

Işq agir e, ten çiyayê Tûre e

Dilewşe cêra bi nar û nûre

Mişka te qefes, qebes çiraye

Can zeyte, fetîlê wî cefaye

Ahmedê Xanî

Di yarî: Jibo Ayîd

Çawa dawî ji nivîsê re nîne, wiha jî hezkirin helbesteke bê dawîye.

Ta niha û di jiyana min de, hîn jî tu ji diyarîyên herî ciwan î.

Pêşgotin

Piştî ku em fêrî tîpên Kurdî (Latînî) bûn, di destpêkê de me pîraniya van helbestan ristibûn , kê m , zêde bi şeweyê Pêlawaz (mîna Kîlasîkên me yê qedirgiran).

Wî çaxî me nedîwêrîbû û jî nedîkîrîbû ,wan vekirî û hişkere belav bikin, yan jî hemîyan di yek berhemî de bidin çapkirin.

Ji lewra gerek bû ev diwan hejmarayekê bigirtana , bi wata yekemîn berhem ronahî bidîtana ,lê di pêş projeyê de asteng pi rîbûn.

Di havîna 2010 –an de û piştî (17) salan ji mişextiyê ...em û bi rêkên taybet derbasî sînorên Qamişlo bûn, û me çavên xwe bi dîtîna Welatê xwe şakir.

Wê gavê û mîna dayika ku zaroka xwe ji mêjve windakiribe û careke din kezba xwe bibîne, me wiha pêşwazî li wan helbestan kir , me ew bi dilşadî û kelogirî li himêza xwe veşarandin.

Di salên (1988- ta 1992) me ew zarok bi navkîrîbû (Çerxa Felekê) ku wî çaxî ji (45) çil û pênc helbestê pêk dihat.

Hêjaye gotinê ku Seydayê Tîrêj û bi rîya hin hevalan re li wan nerîbû, û ji şeweyê me razîbû..û ta niha jî rûpelek bi xêzên destên wî li ba me ye.

Me hin helbest jê rakirin û hinên din tevî kirin,,, salane sal û ev helbest rîngênî di hişê me de dikirin, û bêguman da xwe ji wê rîngênîyê rîzgar bikin, me dawî biryar çapkirina wan stand, hin ji wan me awaz ji wan re çêkirine..helbestê awaza xwe bi me dida çêkirin.

Bi hêviya ku ew cîyê dilxweşî û razîbûna xwênerên helbesta Kurdî bin.

Di gel ciwantirîn ristên Laleyan..... Mizgîn Hesko /Elmaniya-Mijdara (Sermawez) 2013-an



Sernivîs

Qado Şêrîn

Rêvebirê Nivîsînê

Xorşîd Şûzî

Desteya birêvebir

Abdilbaqî Huseynî

Ezîz Xemcivîn

Lawîn Şêxo

Pîr Rustem

Derhêner

Xorşîd Şûzî

Ji bo hinartina berhe mên kurdi:

kurdi.penusanu@gmail.com

Jimarên "Pênûsa Nû" Tev ji vî Emêlî derxînin:

www.penusanu.com

